

WELAT



ro wekî hûn jî
dizanin li Tirkîyeyê
10 hezar girtiyên siyasi hene.
Sendîkavan hene, parêzer
hene, rojnameyan û nivîskar
hene, politîkvan û maşparêz
hene. Heger îro 11 HADEP'î
hatibin berdan, ev nayê wê
maneyê ku dewlet ber bi
demokratbûnê ve gavan
diavêje. Ji bo vê pirsê ku em
bibêjin "Erê Tirkîye gavê ber
bi demokrasiyê ve diavêje"
divê xebatê berfireh bê
kirin "efûya giştî" bê rojevê û
10 hezar girtiyên siyasi bêne
berdan. Ji ber vê yekê jî em ji
berdana xwe re nabêjin ner
mahî û gayavêtin.

RÜPEL 8-9




- **Ji devê BEDRÎ BÖZKUŞÊ ku bûyer jiyaye "Qetliama Girtîgeha Amedê"** Rûpel 3
- **Hevpeyvîna M. AKSOY digel Serokê İHD'ya Amedê Mahmut Şakar bi sernavê "Pirsgirêka kurd heta çareser nebe mafêni mirovan wê bê binpêkirin** Rûpel 16
- **AMED TÎGRÎS li ser gerîlayê Tupac Amaru nivisi "Govenda kurdan û futbola amerîkiyên latînî"** Rûpel 7



Lémê Pêrt: Li pişt têlên rasayî pîrozkirina cejna Qurbanê



Sevda Eldemir: Gel li saziyên xwe yên neteweyî cejna xwe pîroz dike



Cend helbest ji gittegehê

Ji Xwendevanan

Bi destpêka tekoşîna azadiyê em hêdi hêdi hîni xwedî derketina li nasnameya xwe bûn. Bingeha netewebûnê jî ziman e. Bêziman neteweti nabe. Ji bo vê jî rêtixtinê neteweyî yên kû navêwan jî bi zimanê me yê yek bi yek têr sazkarin. Lî xeba-ên li sér ziman, çand têr kîrin. Di vî warî de gelek berhemên hêja têr çapkarin.

Tîstê min hêrs dike, hê jî hin nexweşiyen di nav me de berdewam in. Di hinek bernameyên MED-TV yê de hin "mezinê me" kurdan derdikevin û dibêjin ku "ew nikarin xwe bi kurdî baş "İfade" bikin jî bo wê jî ew dixwazin bi tirkî biaxivîn." Em temagevan jî, wan bi baldai i li guhdaridikin ka ew camêr. wê çawa tîşen zîyari û feylesofî bibêjin û wan tîştan hîni me bikin. Ew heval ku di nav ew qas xebat û têkoşîne de ne û nikarin wan tîştan "ramîrrîya rojane" jî bi zimanê xwe bibêjin.

Gelek jî wan axîferan jî, li welat mezin hûne û zimanê xwe jî, berî tirkî hûn hûne. Ew bi zimanê xwe naçeyîn jî ber ku ew nikarin hevokên dûv û dirêj çêbikin. Hevokên xwe nikarin binexşînin bi biwîjine wekî "gerçeklik" hwd.

Ev nexweşî jî me re jî çepgirên tirk maye. Divê em xwe jî wan nexweşîyan rizgar bikin, bi zimanê xwe hemû jîyan û ramanîn xwe derbibin. Di nîvîs û axaftinê serokatiyê de jî tê ditin ku, em bi zimanê xwe karin her tîxwe binin zîmîn.

MAMOSTE DILGES

4

7

10

W Hechecik, zarokê kurd û rojnamegeriya kurdî

SAMI TAN

Hefteya çûyî bi rojên taybet derbas bû, pêşî cejna qurba-nê, piştre cejna zarokê tirkan û cejna rojnamegeriya kurdî. Her gel li gorî dab û nêriten xwe cejnên xwe pîroz dikin. Lî wekî her tiştî di vî karî de jî rayedarên tirk ji edetê der in. Serokwezîre tirk cara 25'an bû hecî, heta bigihê neviyê xwe yî nizanim çend mehî jî kir hecî. Bi hezaran misilmanên jidil he-ne ku ji ber xizaniyê bi hesretâ hecibûnê diçin gorê, lê zar û zêçen Erbakan bêhemdî ji kîsê Qral Fahd bûn hecî. Ya Erbakan jî ji hechecikan derbaş bû. Ew her sal bi hatina cejnê re ber û baskan li balafira xwe ya taybet dixe, diçe hecê.

Li gorî baweriya îslâmî kesen ku dibin hecî ji gunehên xwe paqij dibin, lê dema ew guneh bênbarekirin, bi çûna hecê dîsa ew guneh ji holê radibin? Bersîva vê yekê ancax alimên olî bizanibin. Di nav gel de ji bo Erbakan "li ser lingekî deh derwan dike" tê gotin. Heke wisa be,

ger Erbakan bibe hechecik jî nikare gunehêne xwe bide efûkirin.

Lî aliye din kesekî ku xwediyê baweriyeke be, (êdî ew baweri di-be, ew zane) divê nehêle ku kes he-qaretê li baweriya wî bike. Lî me-dît ku generalekî tirk heqaret li Erbakan kir û wî ji bo xatirê parastina desthilatiya bêdesthilatî dengê xwe nekir.

Rewşa mebûs û rîveberên Partiya Refahê dida zanîn ku li hemberî artêşê bi awayê ku tirk dibêjin "stû-yê wan ji mû ziravtir e." Lewre jî li Mekeyê bi girî dilê xwe rihet kirin, gir û kîna di dilê xwe de vala kirin, bi gotineke din deşarj bûn, lê em bawer in ku ji gir û kîna wan a li di-jî gelê-kurd tiştek kêm nebûye.

Heke ne wisa bûya wê bihiştana ku zarokê kurd jî bi nasnameya xwe beşdarî pîrozbahîyen "Cejna Zarokan" bîbi, li ser gelê kurd nedikirin ferz ku ew beşdarî pîrozbahîyen wan bibin û zarokekî kurd bi panzeren xwe nediperçiqandin.

Ji bo me rojeke ku bi qasî van rojê navbirî girîng, salvegera 99'an a weşandina rojnameya yekemîn a kurdan Kurdistanê ye. Wekî tê zanîn ew rojname di 22'ye avrêla 1898'an li Qahireyê dest bi weşanê kiriye. Lî mixabin derdorê kurd, di serî deme rojnamegerên kurd (bi taybeti jî Yekîtiya Rojnamevanê Kurdistanê) ji bo pîrozkirina vê rojê tu çalakî li da nexist. Bi tenê di rojnameya Demokrasiyê de li ser vê mijarê rîzenivîsek derket. Tê bîra me ku sala çûyî li NCYM'ê bi besdariya nûnerên gelek weşanê kurdan semînerek çêbûbû, li wir hin tişhâtin gotin, lê kes li ser gotina xwe nema. Di vê semînerê de hatibû gotin ku sedsaliya vê rojê wekî sala rojnamegeriya kurdî bê daxuyan-din û bi çalakiyên cur bi cur bê pîrozkirin. Lî heke ev helwesta heyî bidome, wê sedsaliya destpêka rojnamegeriya kurdî jî bi vî awayî, bê-deng derbas bibe. Ji bo ku rî li ber vê yekê bê girtin, pêwist e Yekîtiya Rojnamevanê Kurdistanê dest bi-be xwe, her wiha divê rojnamevanê ku li welêt û li metropolên tirkan rojnamegeriyê dikin, li çand 0-zimanê xwe vegeerin, li ser bingeha pîşeyî rîexistina xwe ava bikin.

Qetliam û nalet

Xortê kurdê ke kişay sereyê ci cikardî, pa wêney anti. Êkê keynekî bî, ê kerdi vit û viranî û hewyan rê tecawîz kerdi û kerdi panzerana sûkan miyan de çarnay (geyrey Nay) koyî, rezi, bostanî, meşey, dewî û sûkî nêverday bombey bî û veşyay; welatê kurdan ci rî kerdi cehnem.

mî virazyay û nezdiyê pansey kurdî kişay. Fina (ancî) Sêwaz de 37 roşnîkari û hunermendi çimandê Dewlet ver de weş weş veşyay. Nê qetliaman wina ramit: Bado Serekomar Turgut Özal mard, Süleyman Demirel bi serekomar, Tansu Çiller jî bi Serokwezîra Tirkîye.

O roja tepya bê kurdan kişten, bê devan û sûkanê kurdan veşyayen, hema hema teva nêbi. Jew kurdî kiştena nê-mendî, guniya kurdan şimyê, zek kergî bibiryê, kurdî biryay. Zek mari bîkşê, kurdî kişay, zek awk birsiyo guniya kurdan risyê. Goşan û zincan (pirnîkan) dê kurdana koleksiyon û fizbey virazyay. Hendayê jî nêbi, xortê kurdê ke kişay sereyê ci cikardî, pa wêney anti. Êkê keynekî bî, ê kerdi vit û viranî û hewyan rê tecawîz kerdi û kerdi panzerana sûkan miyan de çarnay (geyrey Nay) koyî, rezi, bostanî, meşey, dewî û sûkî nêverday bombey bî û veşyay; welatê kurdan ci rî kerdi cehnem. Wexto ke nê bî Tansu Çiller Serokwezîra Tirkîye bî, yanê persbenoya nînan Çiller

bî.

Nika jî Erbakan Serokwezîr û Çiller jî cagenoya ey a. Nê kî mi cor de nîsti, iyê hewna ramenê. Nînan re zaf bar-barî û wahşiyin jew Zîndanê Amedî de virazyâ, jew jî dewa Batmanî Hethetî de hîrî gerîla û namedê Hanifi Karabulut de jew dewij weş weş tepişti û kîşî Mayê nêzam gerîlay senî kişî, gorevatena dewijan ê weş tepişte qurşın nayé pa. Zew bî teva kerdo nêkerdo nêzam.

Mayê Hanifi zam verî weş girotpey ra şasetûwa kişto, goşê ci, pîrnîci birnayê û kota ci şiknawa û xeylê ca-dê ci ra goşt birnawo. Nê eşkera bî, wêneyê Hanifi Rojnamevê Demokrasi de û MED-TV de vejjay. Yanê eşkera bî Nika ma pers kim: Jew mardimo ke xtra vajo ez mardim a, tevawo winayîn keno? Bêgumân nezdîdê tevawo winayîn ra nêravêreno. Qandê coya ezo vana Erbakan û Çiller êdê naletê bêrê mardiman viri. Zey Neronî Musolinî û Hitlerî.

MEMED ÇERMÜC



Berdevkê 'Koma Xebatê Ji bo Aştiyê bi hev re' Şanar Yurdatapan, piştî binçavkirina hefteyekê, roja 22'ye avrêlê ji hêla DGM ya Stenbolê ve bi hinceta 'alîkarîya rêxistina PKK'ê û amadekirina pasaporten sexte', li gorî xala 169'an tevî tîrafkar û endamên çeteyâ dewletê Murat İpek û Murat Demir hate girtin. Ji aliye kî din ve Komiser Serdar Alptekin ku alîkarî û piştigiriya çeteyê kiriye serbest hate berdan. Şanar Yurdatapan dema ku ew derxistibûn pêşberî çapemeniyê xwestibû ku hin liştan bibêje, lê polîs rê nedabû wî. Parêzera wî Eren Keskin bûyer mîna komployekê binav kir û da zanîn ku dewlet dixwaze bi vê komploye sütê çeteyan vesêre.



Roja 26'ê avrêlê li KÜRT-KAV ê wê dersên zimanê kurdi dest pê bikin. Li gorî daxuyaniya KÜRK-KAV ê, ew saziya yekemîn ya kurdan e ku ji aliye dewletê ve weki fermî hatiye pejîrandin. Tê gotin ku, qursê zimanê kurdi di roja 26'ê avrêlê û li seat 14.00 wê dest pê bikin. Weki ku tê zanîn KÜRT-KAV ê ji bo dayîna qursê zimanê kurdi bi awayekî fermî û da pejîrandina belgeyên kesen ku qurşê qedandine ji ji aliye dewletê serî li Midüriyeta Perwerdehiyê ya Stenbolê dabû. Lê ev serîfîdan ji aliye Mudüriyeta Perwerdehiyê ya Bajêr ve nehat qebulkirin. Tê gotin ku wê di qursan de zaravayên kurmancî û kirdî (zazakî) bêne ferkirin.

NÛÇE

Bedri Bozkuş di 24' rezbera 1996'an de li girtîgeha Amedê bi hin hevalê xwe ve di êrişâ polisan û leşkeran de birîndar filitîbû, ji devê wî:

Qetliama Girtîgeha Amedê

Piştî sê rojan li Nexweşxaneya Dewletê ez bi ser hişen xwe ve hatim. Di vê navê de assubayekî bihîst ku ez bi xwe ve hatime, hate jûra (oda) me, vegerî ser leşkerê ku li hemberî van dîmenê hovane ji bîr ve çûye û got: "Binêr ku hinek xwînê dibînin, hema di cih de ji bîr ve diçin, lê ew têr kuştin, dîsa ji nû ve bi ser xwe ve têr."

Bedri Bozkuş di dema qetliamê de li Girtîgeha Amedê girtî bû, Bozkuş hefteya çûyi tahliye bû. Wî li ser qetliamê serpêhatiyê xwe wiha ve got:

Di 8'ê rezberê 1996'an de dema ku ez li Mardinkapiyê li qehwxaneyekê rûniştibûn, polisan ez girtim, piştî 4 rojê işkenceyê xedar di 12'ye rezberê de ez derxistim DGM'ê, wan jî bîryara girtina min dan û polisan ez birim Girtîgeha Amedê ya Bi Tipâ E. Ez di qawîşa 18'an de dimam. Roja 24'ê rezberê roja hevdîtinê ji bo qawîşen 18 û 29, di saet dehan de 33 girtî ji bo hevdîtinâ bi seredanvanen xwe re derketin şebekeye. Weki

nûner jî da zanîn ku berê tiştekî wiha nîn bû, beramberî wê gotinê gardiyanan helwesteke tûj nîşan dan û bi me re ketin nîqaşê. Me ji bo tişte ku seredanvanen me anîne tîkin, ji gardiyanan legan ku her tim didan me xwest, lê wan îcar legan nedan. Tevi ku me fêm kir ku ew li dûv hinek provakasyonan in, dîsa ji hevaleki xwe ranegirt, "hûn cîma probleman derdixîn" got û şimakek li gardiyan xist.

Li ser vê yekê gardiyan çû, bangî mudîr kir, mudîr jî hat got: "Hûnê giş cezâyê vê kîrinê bîkişînîn." Piştî ku mudîr çû, deriyêne şekekeyê di ser me re kîlit kirin, em li wir ketin bendewariyeke nexwes. Dema saet bû 13.00 hevalê li qawîşa

26'an agahiya hatina 500 leşker û polisi gihad me.

Di destpêkê me got ka ewe me sewqî ciheki din bikin. Lê dema saet bû 14.00 ji bo ku me vê rewşê (4 saet beredîyi li wir hatibûn kîlitkirin û nî li ber hevdîtinê hatibû girtin.) protesto bikin me dest bi sloganan kir.

Di saet 15.00'an de midûr ji me xwest ku em li ciheki kom bibin. Me fêm nekir ci dibû, ji bo wisa got.



qayde di hevdîtinê berê de digel girtîyan nûner jî derdiket hevdîtinê, lewre di vê hevdîtinê de jî nûnerê girtîgehê bi me re bû. Gava em gihiştin şebekeya di navbera qawîşen 35 û 36'an du gardiyananîya me birfin û gotin ku nûner nikare bi me re derkeve hevdîtinê. Li ser vê yekê

ku em lê diman. Li ser vê yekê me nedizanî ci bikin, em bê berevanî û amadehî hatibûn girtin. Me piştî xwe da hev û em ketin milê hev û di cihê xwe de rûniştin. Leşker û polisan bi mebesta kuştinê bi taybeti li serê me dixistin. Wê gavê di çavên wan de hovîti dihat ditin. Bi derbeyen wan xwîn ji bedena me diherikî erdê, li erdê dibû gol, êdi kesî nedizanî xwîna ku diherike ya kî ye. Bi taybeti dixwestin hevalê nûner bigirin, lê me ew di nav xwe de vesart, kîncen wî kirin, kîncine din danê, dîsa ji girtin û li wî xîstin, di vê navê me dest bi strana "Lêxe gerîla, lêxe!" kir.

Di vê demê me bala xwe dida kîjan alî, xwîn û parçeyen laşê hebû. Allah Al-laha polis û leşkeran tevi qirîna me dibû, dengêkî ecêb derdiket holê. Li gorî pêzannan ku paşê me bihîst li hemberî vê rewşê hinek leşkeran xwe ranegirtin û ji bîr ve çûne. Berî ku ez ji bîr ve biçim, tişte herî dawîn ku tê bîra min jî gola xwînê û laşê parçekir yê hevalan bû.

Di li jûra (oda) idareyê bi janeke xurt

bi ser hişen xwe ve hatim. Doktorekî bi derziyên birînên serê min didirû, lê wî karê xwe ew qas bêdilşewat û bêpaxav dikir ku canê min gelekî diêşand. Li ser vê yekê ez dîsa ji bîr ve çûm, piştî sê rojan li Nexweşxaneya Dewletê ez bi ser hişen xwe ve hatim.

Her derê bedena birîndar bû, min nikaribû xwe leqînim, lê li ser serê min du leşkeran nobet digirt. Di vê navê de assubayekî bihîst ku ez bi xwe ve hatime, hate jûra me, vegerî ser leşkerê ku li hemberî van dîmenê hovane ji bîr ve çûye û got: "Binêr ku hinek xwînê dibînin, hema di cih de ji bîr ve diçin, lê ew têr kuştin, dîsa ji nû ve bi ser xwe ve têr." Ez 11 rojan bi ranza ve zincîkirî li newxeşaneyê mam. Sê roj ji wan bi best û pêkutiyê derbas, dixwestin min bikin iîträfkar, lê min ev yek nepejîrand. Piştî van 11 rojan ez birim Girtîgeha Dilükê. Hê jî gelek birîn di laşê min de hene, lê ev birîn li hemberî birîna ku bi kuştina 11 hevalan di derûniya (psikoloji) min de çêbû, ne tiştek in.

Em zarokên xwe bi tenê nahêlin



Li gorî daxuyaniya malbatan rojîya mirinê ber bi cil rojan ve diçe û bi besdariya cil kesî jî tê domandin. Malbatan da zanîn ku ewê heya dawiyê li cem zarokên xwe cih bigirin û ger pêwist be ewê xwe bişewtinin. Ji aliye kî din ve nûnera Komîsona Girtîgehan ya İHD Mukaddes Alatas diyar kir ku, li Girtîgeha Erziromê çalakîyen sporê ji aliye dozger ve hatine qedexekirin û malbat nikarin bi zarokên xwe re bi kurdi biaxivin.

Her wiha hat daxuyand ku bi navê Sevgî İnce gerîlayeke PKK'yi bi birîndarî ji aliye leşkeren tirk ve hatiye girtin, lê li dora 10 mehan e ku nayê te-dawikirin. Li gorî daxuyaniya diya Sevgî İnce ev niha di girtîgeha Batmanê de dimîne û di singa wê de bêrik (gule) heye tiliyên wê ji perce perce bûne.

Malbaten girtiyen siyasi di roja 23'ê Mavrelê de li İHD'ya Stenbolê derbâre rewşâ girtîgehan a dawî de civîneke çapemeniyê li dar xistin. Di civînê de bi taybeti li ser rewşâ Girtîgeha Erzeromê hate rawestin û hate daxuyandin ku piştî heyetên çavdêriyê ji rewşâ girtîyan neguheriye û heke berpirsîn dewletê helwesta xwe neguheriye ewê li Taksimê dest bi greva birîbûnê bikin.

Li pişt têlên rasayî pîrozkirina cejna Qurbanê



Li her welatê cîhanê hemû mîlet li gorî tore û adetên xwe, beriye ku cejn bê bi çend rojan haziriya xwe ji bo wê rojê di-kin. Mala xwe dixemilinîn, ji xwe û za-rokêن xwe re cil û bergêن nû dikirin, xwarin û vexwarinê herî baş amade di-kin, cejn şahî û şenî ye....

Lê ji bo kurdan?

Ji bo kurdan cejn ne şenî, şinî ye...

Roja mirinê, roja xatirxwestinê ye, roja derdikîsandinê û roja xembariyê ye.

Cîma?

Ji ber ku welatê wan bûye parce parçe. Her çar perçeyên wî bi têlên rasayîn (direhî) cuda bûne, sînorê nû kişandine. Li ser sînorêน nû cendirmê, quleyên çavnêriyê û mayin hene. Kesêن li her du aliye têlan di rojêن cejnê de li hev û du dînihêrin û xemgîn dibin.

Welatê kurdan çawa parce bûye?

Di dema Sasanî û Osmaniyan de (1639) li bajarê Qasrê Şerînê hate peymanek çêkirin. Ei gorî peymanê Kurdistan cara yekemîn di navbera tirk û farisan de hate parvekirin. Piştî pey-

na Lozanê (1924) tirk û îngilizan cara duyemîn Kurdistan parve kirin. Ji sala (1926) şûn de Kurdistanê rewşa xwe ya iroyin a çar perçeyî girt.

Ji wê rojê pê ve gelê kurd rojekê baş nedît. Cejn û şahîyen wan qet bi dil û can derbas nebûne.

Gelê kurd jî parçeyen Kurdistanê mîna Kurdistanâ İranê (Rojhilat), Kurdistanâ Iraq (Başûr, Başûrê Mezin), Kurdistanâ Sûriyê (Başûrê Biçûk) û Kurdistanâ Tirkîyê ji (Bakur) bi nav kirin.

Serokê Heyeta Tirk İsmet İnönü di dema peymana Lozanê de der barê kurd û Kurdistanê de wiha gotibû:

“Serokê Heyeta İngiliz Lord Curzan dibêje ku ‘kurd neteweyeke din e fû ew naxwazin bi tirkan re, di nav dewletekê de bijîne.’

Ev idia ne rast e. Bi sed salan e ku tirk û kurd, bi hev du re dijîn. Em di wa-re nîjad, tore û ol de yek in, kurdan qeder û jiyana xwe bi ya tirkan ve girê dane.”

Piştî darvekirina Şêx Seid, kurên wî rêveberên din xwe avêtin Rojhilat yan jî Başûrê Biçûk. Serdarê Serhildana Aghî û Zilan (1930) İhsan Nuri Paşa û Simko

Axa bi sînor nasnekirina xwe bûbû nav-dar. Geh li Bakur geh jî Li rojhilat dijiyan. Piştî Serhildana Dêrsimê (rezbera 1937'an) de Dr. Nuri Dêrsimî û hevalên wî jî li Başûrê Biçûk jiyana xwe dido-mandin.

Ji avabûna Mehabadê heta ARGK'ê

Di sala 1946'an de dema ku Komara Kurdistanê li Mehabadê ava bû, piştî rên wan ji Başûr Mustefa Barzanî û pêşmergên wî û ji Bakur jî eşîrên Agirî bû. Piştî darvekirina Qazî Mihemed, Barzanî bi pêşmerge û malbatâ xwe ve di nav sînorêن İran û Tirkîyê re bi meşa dirêj xwe gihad warê kurdên Qafqasyayê. Ew bi vê çalakiya xwe li cîhanê hatin nasîn û nav û deng dan.

Di sala 1970 an de ji Sait Kirmızı-toprak (Dr. Şivan) Sait Elçi, Kemal Burkay, Faik Savaş û rewşenbîrên kurdên Bakur yêñ din ji ber zîlma dijminê barbar reviyan cûn Başin, li wir bi cih bûn ji bo demekê. Lê mixabin her du Sait ketin kemîna dijmin, hê ji ev rûpe-la dîroka me tarî ye, bi rastî û zelalî ne-hatiye nivîsin. Ziya Şerefçanoğlu ji xwe

avêtibû nav kurdên Lübnanê.

Di adara 1988'an de Saddamê xwînxwar bombeyên jehrawî avêtin Helepçê, 5000 insanê kurd kuştin, 80.000 kurdên Başûr xwe avêtin he-mbêza kurdên bakur. Li Tirkîyê li kam-pênen Qoser (Kızıltepe), Amed û Mûşê bi cih bûn, li hawirdora war têlên rasayîn hatin kişand. Di avrêla 1991'ê de ji piştî Şerê Kendavê bi milyonan kurdên Başûr dîsa li Bakur û Rojhilat bûne pe-nahende.

Piştî salên 1980'yi ji Hêzê Rizgari-ya Kurdistanê (HRK) li bakurê saz bû, baregehê xwe yê navendî kişand Başûr. Ji sala 1983'yan de Fermandarê HRK'ê Mehmet Karasungur li Başûr ket kemîna bêbextan û hate kuştin. Artêşa Rizgariya Gelên Kurdistan (ARGK) di destpêkê de artêşa kurdên Bakur bû, ni-ha bûye artêşa neteweyî û hinék barege-hênen wê niha li Başûr in. Şervanê ARGK'ê ji her çar aliye welatê me jiya-na xwe didomînin.

Yanû bi kurtahî em dikarin bêjîn ku, kurd kengî di tengasiyê de bimîne xwe diavêje nav perçeyen din û bawerîna xwe bi gelê xwe yên perçeyen din tîne.

Ji aliye kî ve medyaya tîrkan li ser cendekê gerîlayêن Başûr dibêjin: "Ev leyistoka biyaniyan e, ev neyarin, çi karê insanê Sûrî li ser axa me heye? Ev hemû ermenî ne, sunet jî nebûne."

Li aliye din artêsa tîrkan di van salen dawîn de gelek caran sînorê Iraqê derbas bûn, çûn Başûr qaso li gerîlayê ARGK'ê digerin. Tu dibêjî qey riya ava bavê wan e.

Îsal li gelek deverên Kurdistanê gelê me hatîb ber têlêna rasayîn ên ser sînor ku li ser sînor cejna qurbanê ya nas û lêzimên xwe pîroz bikin. Lî rayedaren tîrkan danûstandina çekan dikin hincet û destûr nedan wan.

Ola kurd û tîrkan yêke gelo?

Ma Ismet Înönü, di dema Peymana Lozanê de negotibû ola me û kurdan yek e. Madem ola me yek e, çima nahêlin ku em cejna xwe (bi dûr ve jî dibe em dost û nas û lêzimê xwe bibînin) pîroz bikin. Ma cejna qurbanê kengî bûye yek roj? Gelo li ber têlêna rasayîn li ber çavên cendirmeyêncereqolan çawa danûstandinê çekan dikin? "Guh dirojô û gotin giro" ji gora xwe rabe û bersiv bide van qesmîriyên rîveberên komara xwe!

Di danezana Gerdûnî ya Mafêni Mirov de tê gotin ku "mafê her kesî heye ku di nav sînorêne dewletekê de bi serbestî çûn û hatînê bike û cihê mayina xwe bibijêre. mafê herkesî heye ku ji her welatiyê wî bi xwe jî tê de, derkeve û vegere welatê xwe."

Sazdeh hezar kurdên bakurî ji ber êrisêne dewletê tîrkan reviyane Barege-

ha Etrûşê. Di destpêka adarê 1994'ân de bi darê zoñê ji gundêna xwe hatine derkirin û li Baregeha Etrûşê (li başûrê Kurdistanê) bûbûn penahende, niha ew ji hev belav kirin, geleken wan çûn li Iraqê bi cih bûn.

Di vî warî de em hinek ji deng dibin hunermendêna xwe.

Xwediyê alifbaya kurdi (bi tipêna latîn) û rewşenbirêne mezin Celadet Bedirxan (temenê wî zêdeyi penaberî de diçû) di helbestê xwe yê navdar "Beriya Botan" de dibêjê:

Kanî Dersew, ka Herekol, ka Kepir Ka zozanê Bavê Têlî, ka kê bir

J i ber ku welatê wan bûye parça parça. Her çar perçeyen wî bi têlêna rasayîn (direhî) cuda bûne, sînorê nû kişandine. Li ser sînorêne nû cendirme, quleyên çavnîri û mayin hene. Kesêni li her du aliye têlan di rojêna cejnê de li hev û du dînihêrin û xemgîn dibin.

Dibêjin ku birca Belek hilwei Text û baxtê botiyan de ka gesi Herê lawo tevde çûnê nîn in nîn Destê me de ne hesp mane ne jî zîn. Kurdistanê tu abadîn, her heyî İro, sibe û hergav jî dê hebî.

Ahmed Arif li ser kuştina 33 kurdên li Newala Sefo (li ser sînorê Kurdistanâ Bakur û Rojhilat e, hê jî ev newala hawirdora wê bi notirvanen û bi çek û têlan rapêçandinê, destûr nadin ku, lêzimên wan cendekên xwe bistînîn) de hest û ramanen xwe di helbesta xwe de wiha anîbû ziman.

Em cîranê hev û din in, em li rex hev in

Mirîşkên me tev li hev dibin

Ne ji nezaniye
Ji xizaniyê
Em ji pasaportê dilsar in
Ev jî cirma sedema kuştina me ye
Ü hêdî navê me jî yê bikin eşkiya
•Qaçaxçî
Rêbir
û xayin...

Hozanê me yê herî mezin Cegerxwîn li ser nasnekirina sînoran geleb helbest ristine, ji wan helbestan yek bûye stran û Stranbêj Şîrîn jî bi dengê xwe yê dilşewat distrîne. Navê wê "Bijî bijî Kurdistan", tê de tê gotin ku her çar xêzen Kurdistan tiji piling û şer in û

sînorêne me xweş hatine destnîşankirin.
Ji Sêwas ta bi Kêrman

Bijî bijî Kurdistan
Cigerxwîn di helbesta xwe 'Bêriye Welat' de jî hemû cih û warêne çar perçeyen Kurdistanê hejmartine. Cegerxwîn ji te dipirsi kanî derman li ku ye? Haya te heye ji lehengen Kurdistanê bi xwîna xwe birîna te derman kirine. Xwezi te MED-TV'ya me jî bidîtiya.

Xwediyê wêne yê li sîrgûnê Cemal Abdo jî temayênen wêneyen xwe zêdeyi ji têlêna rasayîne hilbijartine.

Yêlo (Yılmaz Güney) dema ku dest avêt karê sînemayê, sînorêne Başûrê Biçük û Bakur û pirsa qaçaxçîyan û zêviyên mayinan kir mijar. Lewre jî ew ke-

sêni li jor li aliye me bûne navdar, we-latperwer, li cem dijmin jî bûne hedfîn êrişan, bûne kesen ku nayen xwestin dîsa jî bi taybetî gelê kurd û hemû gelên Tirkîyeyê herî zede ji filmen Yello hez dikan. Generalen tîrkan bi xwe ji filmen wî hez dikan.

Kurdistan mêtîngeheke çawa ye?

Sosyologe mezin kurdnas Ismail Beşikçi jî navê berhema xwe ya mezin tir kiriye "Devletlerarasi Sömürge Kurdistan" yane, "Metîngeha Navdewletan Kurdistan." Wî di vê pirtûkê de parçebûna Kurdistanê jî her alî ve da-hûrandiye. Dewleten dagirker jî xelata wî ji sed hezarî zedetir heps û bi milyaran cezayê pereyan dan wî.

Têlêna rasayî yên Kurdistanê ji bedena Berlinê erjengtir in. Ez hêvidar im ku rojek wê bê, eme jî mîna gelê alman bi derbikan bi şahî û şenî van sînorêne çekirî (sûnî) ku dijiminêne me kişandine rabikin û bi xwîşk û biratî bikevin hembeza hev, cejna hev pîroz bikin û bi serbestî diyariyan bidin hev.


Werin em bi hev re helbesta Seydayê Keleş bi dengê bilind û xurt dubare bikin.

Kurdistan tev a me ye
Ji bo ci çar perçeyen
Bo ci dijmin tê da ye
Vêna qebûl nakim ebed
Van sînora rakin gerek
Kurdê me tev ger nabin yek
Li ser dijmin nekin serek
Tu car qebûl nakim ebed

LEMÊ PERT

Mîrata Ehmedê Xanî

MEDENÎ FERHO



Raman, hebûna civakan pêk tîne.. Ev gotin kengî, ji hêla kê ve hatîye gotin nayê hişê min.

Pir ne girîng e. Ya pêwist ew e ku di nava hûnandina hevokê de dûrnîneke dorfireh, kûr û dûr heye. Ji ber ku neteweyeti, ji njadekê zedetir çand û avahîyen hismendîne. Mirov dimirin, malbat belav dibin, êl ji holê radibin. Nijad, bi rabûna êlan û belavbûna malbatan, hin jî bi bandora olî û guhertînen civakî reng diuguherin. Piraniya caran ev reng guhartin dibe sedema têkçûna njadan. Helbet raman ji têne guhartin; lê guhartinâ ramanan, ne mîna njadan têkçûn e, nûjenî ye. Reng guhartin, yan jî bêdengiyâ njadan bi rewşa demê ve nayê girêdan. Ji ber ku héza xwe ne ji raman û hismendîya demê distîn. Raman û hismendîya demê kûr û dûr bi encam û hoyen civakî û pêwistîyen pêşerojan ve girêdayî ye. Lî, njad xwe serdestî her tişti dibîne û bi pêşerojê re mijûl nabe, bes, mîna qijnikê, daxwaza erka mijoker dike. Di sed-

sala bîstan de, civakîn ku njadperest hatine hejmartin û dîroka wan bi xwînê hatîye nîvîsandin, di nava gevzeke malaqîyan de her roja diçe bêhtîrîn şermez û rûrêş dibin. Mînaka dawî çavan njadperestiya

Tirkîyeyê ye ku rê û rîbûwar li ber tevger û têkîliyêne wê hatine girtin. Ji ber vê çendê, heya jê tê, dest dirêjiyêne derî mirovaniyê dike û pêkhatînîn aşifteyî dike. Bi rastî ez naxwazîm li ser pêkanîn û destdirêjiyêne dewleta tîr, ku kirêti jê dibare, rawestim. Lewra dixwazim ku li ser ramana bingeha avahiya civakan rawestim. Bêguman hinek mirov mîna ronâhiyê ne. Ne cih û warê lê dijîn bi tenê ronî dîkin, derdorêne xwe bi dorfirê û pişî mirina xwe jî dibine çavkaniyê ronahiya têr tîrêj. Yek ji van mirovan Ehmedê Xanî ye, ku destpêka neteweyeta gelê kurd e. Kurdologen cihanî tev di vê pirsê de digihîne hev û din. Bi têgihiştina felsefîk ya sedsala 17'ân ku Ehmedê Xanî tê de dijî, bi ramangîriyeke sistematîk gîha daxwaz û hêviyêne dewletî. Heya iro ji, ev ramangîriya ku hêvî û daxwaz tê de hene, bûye bingeha pêşerojîn civaka kurdan. Her çiqasî dijberen gelê kurd bi njadperestiyeq neqam nêzîkî pirsgirêka neteweyâ kurdan bibe ji, qonaxa iro, ew felsefeya

Ehmedê Xanî kiriye nava jiyana rojane û hêviyêne mezin ji bo pêşerojan dide. Îcar, ji bo ku demek bibe dîrok, divê ku ji kes û kûsên wê demê xelas bibe û nîşen piştre li gorî dîtin û çavdêriya nîşê berî xwe, rastiyê binivise û bike malê dîrokê. Lewra pêwistîya çavdêriya mirovîn iroyîn girîng e. Da ku civakî bigîhîn wateyêne serkeftinê û bi xwebawerîyê, da ku ji bo nîşê dûv xwe karîbin bibin çavkanî û rîzân.

Ji bî: nekin.. Rêzanî û rînasî xisleten serdariyê ne.

Divê di xwendina kurdî de em bi ser bikevin

Gelî xwendevanên Azadiya Welat, gelî welatparêzên ku rojnemeyê naxwînin û hînî zimanê xwe nebûne! Hewl bidin xwe. Liv û lebat û bîryar wê serkeftinê bîne.
Ji bîr nekin, ev xebat a azadiya ziman e. Ev şoreş a welat e. Divê em bi ser bikevin.

Em xwendevanên rojnameya Azadiya Welat li deverên cur bi cur dijîn. Li her deverê jî, ji bo xwendina rojnameyê astengiyê cihê cihê derdikevin pêşberî me. Li welêt astengiya belavbûnê û tirsa xwendina rojnameyeke bi kurdî. Li metrepolan jibirkirina ziman xemsarı û nebûna diravan. Li Ewrûpayê dîsa belavkirina rojnameyê xemsarı û jibirkirina ziman. Van astengiyâ hîn jî mirov dikare zêde bike. Lê ya herî girîng; xemsarı, xemsarı, xemsarı... Xemsarı li her deverê xuya dike.

Gelek mirovên kurd ên welatparêz, dibêjin "Ma va ye ez bi tirkî dixwînim û ez peywira xwe ya welatparêzî bi cih tînim." Ji bîr dikin ku ziman hîmê netewetiyê ye û nîşana welatparêziye ye. Hin dibêjin, bi min giran tê. Gelo mirov dest pê neke, wê çawa hîn bibe? Hin dibêjin pere tune ye. Ev jî ne tişteki rast e. Heke mirov bixwaze, mirov dikare ji binê erdê jî rojnameyê derxe û bixwine. Hin jî dibêjin em ji tirsa naxwînin. Ev jî dema mirov bibêje "Tirs heta kengî" mirovê bibîne ku ev jî ne pirsgirêkeke rast e.

Ji bo ku xwendina zimanê kurdî û xwendevanên rojnameya pir bibin divê herkes xwe berpirs bibîne. Ji bo ci rojname hindik û ne bi dilê me tê xwendin? Gelo xwendevan ji xwe dipirsin an na? Bêguman gelek xwendevan ji xwe dipirsin û hewl didin ku hejmara xwendevanen pir bikin. Lê hinek jî tenê rojnameya xwe dixwînin an diavêjin ser sergo an jî diavêjin tifîkê. Kî dixwîn, hejmara xwendevanen çend e? Qet ne xema wan e.

Hewce nake ku em behsa pêkûtiya mirovên kurd ji bo zimanê xwe kişandîne, bikin, hewce nake ku em bibêjin filan kesi ew qas ceza xwariye, ew qas mirov şehîd bûne. Vê mijarê xwendevan û welatparêz pir an hindik dizanin. Mijara ku hewce ye em li ser bisekinin ev e: "Em dikarin ci bikin?"

Bêguman xwendina rjonameyeke bi kurdî rîşkek e, bi taybetî li welêt. Lê dîsa gelek tişt hene ku xwendevan dikarin bikin. Divê ci ji destê mirov bê, mirov bike. Heke derfet kêm bin, divê em derfetan biafirin û rê vekin.

Heke mirov bifikire, şoreşa rizgar-

yê çawa hatiye vê radeyê, mirovê kurd çawa li ber hemû astengiyâ û pêkutiyâ ji xwe re derfet çekirine û afirandine; mirov wê fêm bike ku dawiya derfetan nayê. Divê mirov li derfetan bigere, yek nebû, du-du, dudu nebû sisê, sisê nebû şes, şes nebû deh. Heta em bi gîhîjin armanca xwe divê em li derfetan pêledar bibin. Gelek derfet hene ku gelek xwendevan li wan nafikirin.

Mînak: Her xwendevanek dikare xwendevanekî din bibîne û hînî xwendinê bike. Xwendevan dikare, cihê ku lê ye rî li ber xwendinê veke û li ser pirsgirêka firotina rojnameyê bisekiye. Her xwendevanek divê bibe bayiyek.

Xwendevanên di partîyan de, di komeleyan de dikarin xwendina rojnameyê bidin hezkirin û bala hevalen xwe bikişin ser rojnameyê. Mînakek balkêş: Partiya HADEP'ê li her navend û navçeyan rojnameyê bikire ev dihe-re çiqası?

Bêguman kirîna rojnameyê ne bes e. Em nabêjin ku bila dirav werin û xwendin hîc e. Divê bê xwendin jî. Dema ku mirov bikire û li partîyê deynê, miheqeq wê hinek bixwînin. Carekê du caran, deh caran wê bala mirovan bikişîne. Ev mînak ji Komeleyan re ji eynî ye. Welatparêzén di komeleyan de ne, divê vê yekê pêk bînin.

Li hin deveran, mirov dînihêre ku, diravên gelek xortan tune ne ku rojnameyê bikirin. Dilê wan heye lê dirav tune ye. Dema ku belaş zeft bikin, dixwînin wekî din nikarin. Mînak; şagirtên li bajarên mezin in.

Hin mirov jî hene û ji xwe re dibêjin em welatparêz in. Bi milyonan diravên wan bêsedem bi ber bê dikevin. Gelo ew mirov çima naxwînin? Gelo çima du, sê rojnameyan nakirin û belav nakin. Xwendevanên rojnameyê ji hinek hene ku dikarin sisê an pênc rojnameyan bikirin û belav bikin an bidine yên



ku nikarin bikirin.

Lê mirovên li Ewrûpayê? Çima ew qas hindik bi zimanê xwe dixwînin. Gelo ew jî pereyê wan tune ne, an tirsa xwendinê, xwe eşkerekirinê li wê derê jî heye? Li Ewrûpayê hin mirov hene ku dikarin hefteyekê deh rojnameyan bikirin û belav bikin. Bêguman pirsgirêkên welat pir in û peywir jî pir in. Lê pirsgirêk jî, ji wan pirsgirêkan a herî girîng e. Tenê bîryar lazim e ku mirov bibêje: "Ezê ji niha û pê ve sisê an pênc rojnameyan bikirim û belav bikim."

Geli xwendevanên Azadiya Welat, gelî welatparêzên ku rojnemeyê naxwînin û hînî zimanê xwe nebûne! Hewl

bidin xwe.

Liv û lebat û bîryar wê serkeftinê bîne. Ji bîr nekin, ev xebata azadiya ziman e. Ev şoreş a welat e. Divê em bi ser bikevin. Miheqeq divê emi bi ser bikevin. Ger her kes xwe berpirs bibîne wê xwendina kurdî zêde bibe. Heke firaja rojnameyê çar hezar be wê bibe heş hezar, heke heş hezar be, wê bibe şazdeh hezar û hwd. Ev jî di dawîye de wê bibe şazdeh hezar û hîn pirtir mosteyen zimanê kurdî.

Bi dirûşma "Azadiya Ziman Azadiya Welat e" bimînin di xweşiyê de serkeftin ji we re.

ÇIYA MAZ



Gel li saziyên xwe yên neteweyî cejna xwe pîroz dike



"Bi taybetî keç û xorten ciwan ên kurd êdî, dixwazin bi çand û hunera xwe re bin. Ji ber vê yekê dev ji muzik û kultura asimilekirî û ya biyan berdane û berê xwe dane saziyên xwe yên neteweyî."

Roja Cajna Qurbanê ya sêyemin, Navenda Çanda Mezopotamya bû cihê pîrozkirina cejnê.

Koma Agirê Jiyan ji bo pîrozkirina cejna Qurbanê, roja 20'ê avrêlê li NÇM'ê bi konserke xwe ya taybet û xwes, derket pêşberî hunerhezan. Her wiha komê ji bo konserekê xwe amade kiribû, lê ji ber pîrbûna beşdaran sê konser bi dû hev re dan û mîvanen xwe ku hin jê ta ji Edirneyê ji bo guhdarkirina wê hatibûn, kêfxwes kir. Her sê caran jî salona NÇM'ê ya konserê ji insanan mist (tiji) bû. Yanî nêzî 800'ı kes, wê rojê bûn guhdarê muzika Koma Agirê Jiyan.

Komê di her seanseke de 13-14 stran gotin. Koma Agirê Jiyan ligel stranen xwe yên ku di kasetê de derkine, hinênu nû çêkirine ji weki 'Azad e' û 'Mişko' ku stranek gelêri ya ji hêla Serhedê ye pêşkêsi mîvanan kir. Ev stran jî weki yên komê, yên din bi gotin û muzika xwe xwes in û mirov coş dikin. Kom ji aliye mîvanan ve bi coşke mezin hate guhdar û temaskekirin. Her

- 30.04.1975: Hêzên şoreşger ên Vietnamê, Paytexta Vietnamê Başûr Saygon bi dest xistin. Pişî berxwedaneke dirêj, liemberî hêzên dagirker ên amerîkî, hêzên Vietkong, ku bi rîberiya Partiya Karker a Vietnamê şer dikirin, parçeyê başûr ê welatê xwe rizgar kirin û bi temamî gîhşîtin serxwebûna xwe. Di vî şerî de 3.5 milyon kesf canê xwe dan.
- 3.05.1973: İnternasyonalistê kurd Avni Gökoğlu, dema ku ji Filistinê yedigeriya Tirkîyê, ji aliye leşkeren Tirkîyê ve hate kuştin.
- 1 Gulan: Roja Cejna karkeren Cihan
- 01.05.1977: Di pîrozkirina Cejna Karkeran a sala 1977'an de li

Meydana Taksîma Stenbolê ku paşê ji hêla derdorê azadîxwaz ve weki Meydana 1'ê Gulanê hate binavkirin, hêzên kontrayî êris birin ser 5 hezar kedkarê ku cejna xwe pîroz dikirin. Di vê êrisa gulebaranî de, 37. kedkar hatin kuştin, bi sedan kes ji birîndar bûn.

- 02.03.1983: Li başûrê Kurdistanê Mehmet Karasungur û Ibrahim Bitgin, ji aliye hêzên YNK'ê ve hatin kuştin. Van her du kesan ji bo ku di navbera her du hêzên başûr; YNK û PDK'ê de aşî çebibe navbertî dikirin.
- 02.05.1992: Karbidestê HEP'ê yê Nisêbînê Ismail İrmak, ji aliye hêzên tarî ve hate kuştin.

AWIR

CAVDÊRÎ



Gövenda kurdan û futbola amerîkiyên latînî

L i ser govendgiriya kurdan pêkenîneke gelek seyr û matmayî heye. Tê gotin ku çend kurd ji Amedê balafirek revandine û birine li welatekî Ewrûpayê li balafirge-hekê dane rawestandin. Di balafirê de gelek wezîr û kesen mezin û navdar hebûne. Kurdên şoreşger ku dewleta tirk ji wan re dibêjin korsan, li wir ji çapemeniyê re daxwaz û armancê xwe dane xuya kirin. Polisên Ewrûpayê kirine nekarin bûne bi xwesî û qencî balafirevên kurd tîna bikin û rehînan ji destê wan rizgar bikin. Pişte ew mecbûr dimîn û li dijî kurdên "korsan" dest bi metodê zor û şîdetê dîkin. Polisên ewrûpî nekarin bi yê metodê ji bi ser bikevin û rehînan ji destê kurdan rizgar bikin. Wiha balafir çend roj li balafirgehê dimîne. Polisên návneteweyî kom-dibin ku çawa bêqeza û bela réwiyen ku di destê kurdan de ne; rizgar bikin!

Ewrûpî li hev du kom dibin û şêwirmendiyek mezin li dar dixin. Di dawiyê de bar dikeve-ser milen kurdnas û civaknasen ewrûpî. Ew kom dibin û li ser xû, zeaf û jarbu-na karekteren kurdan radiwestin. Bi hevdû dişewirin, şîroveyan dîkin û dixwazin bigîhîne ençamekê. Di dawiyê de ji wan kurdnasen yek weki Arşîmet dîbêje: "Min dit." Hemû bi heyecan li der û dörê kom dibin û ew kurdnas pêşniyaza xwe ya çareseriyê wiha tîne zimên:

"Kurd gelek ji govendê hez dîkin. Hün herin def û zirneke binin balafirgehê û bila meqâmî kurdî lêxin: Bi taybetî meqâmî Delilo.. Çend kurdên cehş jî bînîn bila ew ji li meydana balafirgehê govendê bigirin. Dema dengê def û zirneyê here korsan û ew bibînîn ku li der govend geş e; wê demê ew nekarin xwe rabigirin. Ew dê ji ber xwe ve yeko derkevin, bêñ û bikevin govendê. Em jî dê bê qeza û bela wan bigirin û her wiha girtiyen xwe yên balafir jî rizgar bikin. Bi Isa, Mûsa û Muhammed pozê tu kesi jî xwîn nabe."

Polis, pêşniyaza wî Kurdnas ewrûpî dixin jiyanê û bi rastî ji dema dengê def û zirneyê diçe ew kurdên ku balafir revandine yek bi yek derkevin der û tên dikevin qora govendê. Her wiha ewrûpî jî, bi başî û xwesî, ji wê bela û qezaya mezin rizgar dibin.

Belê, me dizanibû ku lañin amerîkî jî gelek ji futbolê hez dîkin, lê ne futbola ku gerîla pê finala mirina xwe dilîzin. Weki tê zanîn, li Lîmaya paytaxta Perûye 126 roj bûn ku garîlayen Tupac Amaru 72 kes di Konsolosxaneya Japonyayê yâ Limayê de rehîne girtibûn. Di nav wan rehîneyan de wezîr, konsolos, serokê dageha bilind, serokên polis û gelek kesen din hebûn. Dewleta Perû ji bo serbestberdane rehîneyan ji hemû dewletê cihanê alîkarî xwest. Nebû. Dewletê çar meh bi gerîlayan re gotûbêj û guftûgo kir, dîsa nebû. Xwest çend caran li dijî gerîlayan operasyonê pêk bîne bi ser neket. Di dawiyê de weki ewrûpiyan civaknasen Peruyan berhevkinin û li ser jarbûn û zeafen perûyiyan mijûl bûn. Yekî ji wan got ku: "Min dit! Gogekê (topek) bisin hundir. Dema gerîla gogê bibînin, ew dê weki kurdên govendgê nekarin xwe rabigirin. Yan derkevin der, nav bexçeyê-konsolosê yan jî dê di salona mezin de dest bi listika futbolê bikin. Em jî dê wan bidin ber devê top û mîtralozan û her weha pozê rehîneyen me jî xwîn nabe û em dê hemûyan rizgar bikin.

Belê pişti 126 rojan, di roja 23'ê nîsana 1997'an de goga mirinê şandin hundirê konsolosê. Gerîla bi dîtina gogê dilgêş bûn. Latîn amerîkî be û 126 roj li ser hevdû futbolê nelîze! Êdû xwarin jî di qirika wan de nedîcû û ji bo pawaniyê (nobedariyê) 3 hevalen xwe yên gerîla hiştin û 11 gerîla derbasî alîyê din bûn û li salona mezin dest bi listika futbolê kirin. Amigo gog dît, êdî gerîlatiya xwe ji bîr kir. Askeren Fûjimori yên xwînxwar salona gogê dan ber devê top û mîtralozan... Di çend deqîqan de 14 gerîla hatin kuştin û hemû rehîne (72 kes) ji destê gerîlayen futbolvan hatin "rizgarkirin".

Belê, ev senaryoya govenda kurdan, çend sal paşê li Perû, li bajare Lîmâyê jiyan dît û ji xeyali bû rastîyeke berbiçav. Di şuna govenda kurdan de bûyera futbola Perûyiyan pêk hat. Sersariyeke biçük dikare trajedyekî wiha mezin bi xwe re bîne holê! Kurdistan li ku û Perû li ku! Gelo ci ferqa Amed-û Lîmâyê heye!

SEVDA ELDEMİR



Wêne: İsmail Erörs

Belê rewşa we li girtîgehê û derive ne mîna hev e. Tu di nav çar dîwaran de yî, ji her tiştî qutbûn heye. Bi tenê girêdana bi derive re bi riya çapemenî û mîvanen ku têr serdananê re ye. Li girtîgehê me gelek pirtûk xwendin, gelek caran me bi hev re nîqaşen li Tirkîyeyê kirin, tiştîn di rojeva Tirkîyeyê de her dem li ser zimanê me bûn.

Birêz Bozlak, wekî tê zanîn 23'ê pûspîra 1996'an dî kongreya xwe ya diyemîn de, bi hinceta daxistina alê tevî hevalen xwe hûn hatin girtin û demeke dirêj girtî man, piştî 10 mehan hûn hatin berdan. Hûn bûyera provakasyonê, pêvajoya girtin û biryara tehliye-bûnê çawa dinirxînin?

Belê em di serî de laqayî bûyereke ku me nedixwest hatin. Ji ber provaqas-yoneke ku tu têkîlî û eleqeya me pê tune bû, em hatin binçavkirin û pişt re jî em hatin girtin. Partiyeke siyasi îro li Tirkîyeyê bêyi delîl û rastîyan bi tenê ji bo daxistina ala tirk dibe hedefen êrisan, di serî de serokê giştî gelek rîvebirîn navenda giştî bi awayen anti-demokratik tene binçavkirin, tadeyi dibînin û paşê jî tene girtin. Ev pêvajoya 10 mehan idome. Ev demeke dirêj e û ji bo me telafîya ze-ratîn me hem siyasi û hem jî cîvâkî ge-lekî zor û zehmet e. Bi vî awayî em biryara mehkemeyê, weki "biryareke de-rengmayî" bi nav dikan.

Di danışma dadgehê de we anî ziman ku ev doz dozeke siyasi ye lê nehiqûqi ye. Hûn dikarin vê gotinê şirove bikin?

Rast e! Eger doz, dozeke hiqûqi

be, divê ji bo tewanbariyê bingeh hebe, delîl hebin, lê hetanî em hatin berdan ji me di dosyayên xwe de delîl û bingehê ke bi vî rengî nedit. Ji ber vê yekê ji ev doz siyasi ye.

Di van rojîn dawî de di nav eniya leşkerî de nermahî derdikeve pêş. Di dadgehê de jî dozgerê leşkerî berdana we xwest, lê dozgerên sivîl li hemberî vê xwestekê derketin. Hûn dikarin bibêjin "leşker helwesta xwe diguherin" ana?

Na em nikarin bibêjin. Îro wekî hûn jî dizanîn li Tirkîyeyê 10 hezar giştî siyasi hene. Sendikavan hene, parêzer hene, rojnamevan û nivîskar hene, politîkvan û mafparêz hene. Heger îro 11 HADEP'î hatibin berdan, ev nayê wê maneyê ku dewlet ber bi demokrasiye ve gavan diavêje. Ji bo yê pîrsê ku em bibêjin "Erê Tirkîye gavê berbi demokrasiye ve diavêje" divê xebatên berfireh bêr kîrin "efûya giştî" bê rojevê û 10 hezar giştîn siyasi bêne berdan. Ji ber vê yekê ji em ji berdانا xwe re na-bêjin nermahî û gavavêtin.

Berî berdانا we bi 2 rojîn di 13'ê avrêlê de li Enqereyê mîtingeke demok-

Serokê Giştî yê HADEP'ê

Bingeha hen Kêşeya

rasiyê ji hêla HADEP, ÖDP, DBP, KESK, IHD, TMMOB û 40 sazî û réxistinan ve hate lidarxistin. Di mîtingê de hate diyarkirin ku, wê di pêşerojê de "Hêzên demokrasi" yê bêne cem hev û bi hev re biryaran bistînin. Hûn der barê vê yekê de ci dibêjin?

● Belê çareyeke din ji bo hêzên demokrasi yê nîn e li Tirkîyeyê. Îro rewşa parlemento û partiyen siyasi ji xwe diyar e. Bi salan e ku an iktîdar in, an jî muxalefet in. Lî disa jî wan Tirkîye idare kirine, lê ev 70 sal e ku tiştek neguheriye. Bingeha sistemeke hiqûqi nehatiye avêtin. Demokrasiyeke rast û durist nehatiye afirandin, pêşveçûnek ji hêla ked û azadiyê nehatiye ditîn. Ji bo gundiyên belengaz û kedkaran guherîneke politîk nîn e. Lî hêla din şerekî ku hê didome li holê ye. Em jî meraq dikin wê kengî guherandinê erêni çêbibin. Hikûmet diçün û têr, lê rewşa siyasi, ekonomik û politîk her ku diçe xerabtir dibe. Ev jî dide xuyakirin ku êdî ew tiştekî ji bo demokrasi, azadi û mafîn mirovan nakin. Dîsa bar dikeve ser milê "hêzên demokrasiyê" ji bo ku hêzên siyasi, rexistinê demokratik û parêzvanen mafîn mirovan divê biryareke bi hev re bis-tînin.

Ji bo ittifakê di serî de ANAP û CHP hewl didine xwe ku bi HADEP'ê re hevkariyê pêk bînin. Bi taybetî Cihgirê Sekreterê Giştî yê CHP'ê Sinan, Yerlikaya gotbû ku 'emê bi HADEP'ê re ittifaqê çêbîkin' li ser vê gotinê hûn dikarin ci-bêjin.

● İttifaqa ci?

İttifaqa hilbijartînê.

● Jixwe vê gavê di rojevê de hilbijartîn tune ye, heger ku hebe jî, ji bo ittifakê bi CHP'ê re têkiliyekî bi vî rengî nayê da-nîn. Bi kê re wê ittifak were çêkirin, ew diyar e. Lî ittifaqekê bi CHP'ê re ne mimkûn e. Ji ber ku wê çaxê dibe ittifaka menfeatê, gel ji bawerî bi ittifaqen bi vî rengî nayine.

Rewşa CHP jixwe diyar e. CHP'ê tu car pîrsîrêka kurd ji xwe re nekiriye piştî û bar, ji îro û sün de jî nake. Ji ber vê yekê tewra CHP'ê jî tewra ji bo menfeatê ye cihê me, her dem li cem ked, azadi û demokrasiyê ye.


ÖDP gelek caran di daxuyaniyên xwe de mesajên piştigirî û hevkariyê ji bo we dide. Gelo di qada têkoşîna siyasi de hûn ÖDP'ê çawa dinirxînin.

● Her çiqas HADEP û ÖDP ji hêla siyaseta xwe ve ji hev cihê bin jî, ji berê

ve têkiliyên germ di nav me de çebûne. Gelek biryar û xêzen me mîna hev in. Her du parti jî bi wateyeke rastin demokrasiyê diparêzin, mafîn mirovan diparêzin, azadiyê diparêzin, hevgirtina 2 partiyan bi vî awayî normal e.

Piştî bûyera Susurlukê gotinê ku hûn û partiyen HEP, DEP û HADEP'ê ev 5 sal in dibêjin, rastiya wan jî derke te holê. Li aliyê din biryaren MGK'ê (Lijneya Ewlekariya Neteweyî) ku li dijî kurdan û saziyên wan bûn hatin eskerekirin. Gelo ji îro û sün de hûn li dijî yan yekan siyaseteke çawa bimeşînin.

● Li gorî me "Komîsyona Susurlukê" wezîfeya xwe neaniye cih. Bi geleksan re axivîne, xebitîne, lê destê xwe neavêtine çavkanî û navendâ bûyera, çavkanî û kesen ku di serlistikvanen Qezayê Susurlukê li OHAL'ê dest pî dike, lê belê xebaşteke komîsyonê em li OHAL'ê nabînin. Ev bi mî dide nîşan ku ji parlementoyê tu encam jî dernake-



Jurat Bozak:

Ô pirsgirêkan kurdî ye

ve, lê tiştê baş ku em pê kefxweş dibin ev e ku piştî bûyera Susurlukê heta iro di nav gel de li dijî van çeteyan reaksiyo-neke gelek tûj hate nişandayîn. Êdî mirrov derdi kevin kûçe ô kolanan qîr dikin, naletê li çete ô mîrkujan dibařinîn.

Tê gotin ku piştî bûyera Susurlukê di nav sîstema Tirkîyeyê de; kadroyen Amerikan kû Mehmet Ağar û Tansu Çiller jî di nav de ne, ji çav ketin, li gel ve yekê jî di nav kadroyen Amerika û kadroyen Ewrûpayê de hevkêseyek ava bû. Ji ber vê yekê jî dişa tê gotin ku li hemberi "hevkêseya hêzan" jî bo "çareser-kirina pirsa kurd" van hêzan li hev kirene. Heta disa tê gotin ku Yewnanîstan jî ji bo navberkariyê ketiye dewrê. Der batê vê yekê de bîr û baweriyyen we ci ne?

• Iro rastiyek heye ku pisgirêka kurd di qada navneteweyî de cihê xwe girtiye. Li hêla din li Rojhilata Navîn jî pisgirêka kurd giraniyekê mezin e û rolekê girîng dilize. Li gorî tecrube û zanînên

me dîtina Amerîka û dewletên Rojava li dijî pirsa kurdî ne baş e. Tiştê ku dikin û dibêjin jî bi temamî ji bo fêdê û berjewendî her dem li pêş in. Ji bo gelê herêmê ev dewletên hanê ne xwedî polîtikayen cidî ne. Ji bo çareseriya pirsgirêkê em ji wan tu tişt hêvi jî nakin.

Ji pêvajoya iro û pê ve di nav HADEP'ê de wê guherandin çêbin.

• Em nû ji girtîgehê derketin. Hevalen me jî xebat û wezîfeyen xwe bi awa-yekî rêk û pêk û baş demeşinin, fealiyeten me didomin.

Hûn dibêjin pirsgirêk wê bi riyen demokratik û siyasi bêne çareserkirin. Ji bo ku pirsgirêk werin çareserkirin hûne bikevin nav xebatên çawa?

• Dîtin û ramatîn me li dijî pirsgirêkan diyar in. Em di bingeha tevahiya pisgirêka de pisgirêka kurdî dibinîn. Heger ku pirsgirêka kurd çareser nebe, ew pisgirêkîn din jî çareser nabin. Iro li Tirkîyeyê li hemberî vê pirsgirêkê ji bîlî polîtikayen leşkerî tu tişt nehatîye kirin. Ji bo vê jî tu encam nehatîye stendin. Em bi kurtahî dibêjin "çek û sîleh tank û barût" ne çareserî ye, netodêna aştiyane nehatine ceribandin. Iro divê pêşî ev xwîn were sekînandin. Heger pisgirêka kurd çareser nebe, xwîn nesekîne ne mimkûn e ku behsa hewlîdanê demokrasiyê werin kirin.

Di rojêner derbasbûyi de cîgirê Serkanê Arteşa Tirk Çevik Bir û der barê pirsa kurd de got ku êdî tiştê em bikin nema, divê êdî siyasetmeder vê yekê çareser bikin. Hûn vê gotinê çawa sîrove dikin, li gorî we cesareta siyasetmeder-an ji vê çareseriye re heye?

• Belê iro hindik bin jî di nav artêşê de general jî dibêjin pirsgirêka kurd bi awa-yekî leşkerî çareser nabe, ew jî daxwaza çareseriye kî siyasi li dijî leşkeran di nav zeafiyetê de ne.

Weki tê zanîn di hilbijartînên parlementoyê de ji ber bendava %10 HADEP neket parlementoyê. Di sîna berrendamîn wê de 25 kes çûnê Meclisa Tirk. Gelo ew kes iro wezîfeyâ xwe bi cih tînîn an na?

• Ew kesen ku herin parlementoyê, aango bibin parlementer divê pêşî, baweriya gel bi wanî hatibe. Lê jî bo bendava %10 li bajarêna mîna Amed, Batman, Hekari, Şırnak û hwd. li bajarê kurdan HADEP ji %50, 60, 70 dengan distîne lê



Lê îttifaqekê bi CHP'ê re ne mimkûn e. Ji ber ku wê çaxê dibe îttifaqa menfeatê, gel jî bawerî bi îttifaqêni bi vî rengî nayine. Rewşa CHP jîxwe diyar e. CHP'ê tu car pirsgirêka kurd ji xwe re nekiriye piştî û bar, ji iro û şûn de jî nake.

Ji ber vê yekê tewra CHP'ê jî tewra ji bo menfeatê ye. Cihê me her dem li cem ked, azadî û demokrasiyê ye.

ji partiyen A, B, C kesen kû gel jî wan re gotiye "Bawerîya min bi te naye" çûne parlementoyê. Ew kes gelê me temsil nakin. Li Amedê HADEP 170 hezar dengan distîne û parlementerekî û bi te-nê jî naşîne meclisî, lê 10 parlementerên din, tevahiya partiyen bi 160 hezar dengan dişine parlementoyê.

Di pêşîya me de 1'ê gulanê heye, gelo plan, proje û bernameyên we jî bo vê rojê di ci merhaleye de ne?

• Di rojêner pêş de ji bo 1'ê gulanê emê rîveberen navendê bîcivînin biryar xebat û bernameyên xwe amade bikin, piş re jî ji bo vê yekê emê daxuyaniyekê çapemeniyê bidin.

Rewşa we li girtîgehê çawa bû. An-go we bi çavekî çawa li derive dînîherî, rojê we bi ci awayî derbas dibûn?

• Belê rewşa we li girtîgehê û derive ne mîna hev e. Tu di nav çar dîwaran de yî, jî her tiştî qutbûn heye. Bi tenê gîredana bi derive re bi riya çapemenî û mîvanîn ku têne serdan re ye. Li girtîgehê me gelek pîttük xwendîn, gelek caran me bi hev re nîqaşen li Tirkîyeyê kirin, tiştîn di-rojeva Tirkîyeyê de her dem li ser zimanî me bûn.

Gelo hûn tev bi hev re bûn?

• Na em di du qawîşan de bûn; 6 heval li qawîşekê, 8 heval jî li qawîşekê din bûn.

Carinan wê dikaribû werin cem hev?

• Heftiyê carek em dibatin cem hev. Carinan jî ku me bixwesta disa ew imkanen me hebûn ku em werin cem hev.

Dema hûn girtîbun, we xebatîn partiyê yên li derive diecibandin.

• Me berê jî got HADEP ne partiya şexsan e. HADEP partiya gel e. Bi girtina 10-15 kesan xebatîn partiyê tu car nasekîne û kêm jî nabe. Em bi xebatîn wan gelekî kefxweş bûn, hevalen me kîmasya kadroyan dernexistin holê.

Cara dawî hun di derbarê Rojnameya Azadiya Welat de ci difikirin?

Ji tevahiya xwendevan û xebatkaren Azadiya Welat re silavîn germ dişinim. Bi rastî jî xebata ku hun dikin teví zor û zehmetiyan jî xebatîkî piroz e, serkeftîne ji we te dixwazim.

MEMED DREWS
SALIHÊ KEVÎRBİRÎ



Çend helbest ji girtîgehê

Dayika min

Ez bêxwedî me, bêkes im
Ez li bin destâ me, hêşir im
Ez dayika we Kurdistan im
Werin min xelas bikin ma qey nebes e...
Dayê dayê, dayika min Kurdistan e
Ez kurê te me.
Ez keça té me
Ez zar ú zêçê te me,
Va ye ez têm' te xelas bikim
Te xelas bikim ji zilm ú zorê
Ji hêşirî
Destê xwe veke dayê
Destê xwe veke
Bêhna te té min,
Min bêriya te kiriye
Min hembêz bike,
Desten te
Çiyayên te
Zozanên te
Çem ú baniyên te fireh in, pir in dayê
Destê xwe ji me re veke
Rêkê xwe ji me re veke
Emê tev bi hev re werin
Xušk ú bira
Jin ú mîr
Kal ú pîr
Emê bêñ te xelas bikin,
te ažad bikin dayê
Sinorê ser sîngê dayika xwe
Emê xira bikin,
Ú emê rakin,
Zincirên bindestiyê

Zincirên koletiyê
Emê bişkinin.
Va ye em hatin dayê
Em hatin
Şervan ú şoreşgerên te
Gerîlayên te.
Silava li şehîdan bike dayê
Silav!
Übeydullah ú Yezdan Şeran
Şêx Seid ú Seyid Rizayan.
Mazlûm ú Egîdan
Xeyrî ú Kemalan
Heqî ú Şehîdan...
Silav li şehîden Kurdistanê bike.
Me sond xwariye li ser xwîna şehîdan
Emê riya wan berdewam bikin
Neyar ú xwînmijan
Ú xwînxwaran
Ji Kurdistanê derxînin
Emê Kurdistan xelas bikin
Azad bikin dayê.
Me sond xwariye li ser xwîna şehîdan
Em dîsa sond dixwin!
An Serkeftin
An Serkeftin!
Bes bigirî dayê,
Bes bigirî
Va ye em hatin,
Emê te xelas bikin
Te azad bikin dayê...
Bes bigirî dayê,
Bes bigirî...
Bes bigirî....

NURETTİN BEXTEWAR



Ax welato

İro ji welatê me
Li hember zilmê
Hêstirê çavan bûn behr
Wekî Ferat,
Wekî Dicle,
Wekî Münzûr
Ew hêstir
Dilê min de bû ser
Şerîn serê çiyan
Ji Agirî hetanî Amanos
Li wan çiyan dibare
Agirê şoreşgerî
Ax welatê çi şerîn
Welatê roja mezin
Ji bona Azadiyê
Ew şoreşgerî
Dermanê dilê hemû karkeran
Li çiyan dimeşin

Wek şeran,
Wek pilingan
De werin, werin
İro ji welat ronahî dibare
Bira kes nebêje
Ji welat dûr ketine
Ax welato
Şterka ciwanan
Hiva şoreşgeran
Agirê ser dilan
Wekî kaniya zemzemê
Kûr e axîna welat
Ax welato
Welatê roja mezin
Kes ne xerîbê te ye êdî
Ji hemû cihanê
Welat welatê
Kurdistanê

CEMALETTİN DEMİRHAN

Te nedîye

Te nedîye xweşikbûna çiya
Bêhna gula ú dengê bilbila
Te nedîye kenê karkeran
Çavê reşbelek, nérîna şera
Te nedîye bi şev ref bi ref
Meşa hevala, wan xorîn hêja
Te nedîye, te nedîye bira
Eşa hezar sala ú kêfxweşîya
pişti çalakiya
Te nedîye bira karê bi hev re
Parkirina derd ú kula
Te nedîye di kozika de
Girêdana bi hev re lêxistina dila
Te nedîye bira pişti şêhîdeki
Şewat ú axîna dilê hogira
Yan jî di êrişekî de, jîrbûna gerîla
Germbûna lûla çekan
Te nedîye bira di nava çiyayê asê de
Govendgirtina gerîla
Te nedîye di nav şîneyekî bêbinî de
Sohbeta hevalan

HÜSEYİN TUNÇ

Aştî

Geli mirovan hemî bibin yek
Şifreke pir mezin deynin
Em hemî kes tev de runê
Sipî ú reşik ger mirov bin
Wê...
Sezar di gorê de biteqe
Hitler jî di gorê de har bibe
Çek di bin axê de birizin
Faşîstê tîrkan jî dîn bibin
Mazlum ú Kemal mamosteyen me

Zarok

Ji dilê min hat min got
Bila xweşikbûna dinê ji te re be
Dilê germ bila bi te re be
Xeyalê xweş ú bêşer
Bila ên te bin zarok
Min dixwest ez wek te bim
Ne min bi dîtina cihana bi qirêj
Ú ne jî kustîna zarokan
Ne jî naîlinen dayikan
Bila ez jî wek te bûma zarok
Di xweşikbûna nérîna te de
Bila ez wînda bibûma
Di kena té de, xwezi ez bifetisiyama
Di xewna te de bila ez pêkenok
bûma zarok

Bi cilên xwe yêng reng bi reng
Bi ala xwe ya kesk ú sor ú zer
Roja cejnê desten min di desten te de
Bila ez jî bi te re bûma zarok
Carina ez jî xwe dipirsim
Wek awayê ku tu

Ne jî vî cihana bi gemarî
An jî min wek tê nedîlist
Tu dibê ci zarok?

HÜSEYİN TUNÇ

Egid bûye rêberê me

Armanca me sosyalizm ú aştî

Apo ye Serokê me

Şoreşger rabin dîlane

Wê...

Mistoyê kor biteqe

Pergala wan bifelişe

Aştî li welat saz bibe

Bila kîvneperest jî dîn bibin

M. EMİN ALTUĞ



Li navendê çandê çalakiyên vê hefteyê
Li Navenda Çanda Mezopotamyayê şaxa Stenbolê
● 27.04.97: Yekşem: Tiyatroya Can Şenliği. Sohbeta li ser tiyatroya alternatif, digel nişandana teatra Newrozê, saet:14.00
Dîlana Koma Serhidian, saet:18.00
Li NÇM'ya Êzmîre
● 27.04.97 Yekşem: Çalakiyên zarokan, folklor, muzik, şîr, saet:14.00
Konferansa di nav kurdan de sazibûn (kürtlerde kurumlaşma), pêşkêşan: Cîgirê Serokê Enstituya Kurdi Hesen Zinar, saet:18.00

- 29.04.97 Sêşem: Konferansa li ser 'Hunera estetikê' M. Zahir Kayan, saet:18.30
- 30.04.97 Çarşem: Şahiya dîlanê gel, saet:18.30
- Li BEKSÂV'ê
 - 28.04.97 Yekşem: Filmê 'Isyan' derhêner: Gillia Pontecarno, saet:19.00
 - 29.04.97 Düşem: Filmê 'Sürü (Kerî)', Derhêner Zeki Ökten, senaryo Yılmaz Güney, saet:19.00
 - 30.04.97 Çarşem: Filmê 'Sol Ayağım (Lingê min i Çepê)' Derhêner Jim Sheridan, saet:19.00

AWIR

Serokê Enstituya kurdi Şefik Beyaz:

Pêdivî bi kurdologên kurd heye

Bi mebesta salvegera dameziran-dina Enstituya Kurdi, roja 23'ê avrêlê ji layê enstituyê ve li salona NÇM'ê şaxa Beyoğlu seminerek hâte lidarxisin. Serokê Enstituya Kurdi Şefik Beyaz û Gerînendeyê Weşanê yê Azadiya Welat Sami Tan wekî axivger besdari semînerê bûn.

Şefik Beyaz da zanîn ku, pêşî xebatî li ser kurdolojiyê bi destê kesêن bîyan (ne kurd) lê zanyar hatine kirin û cara yekem di sala 1887'an de li İtalya-yê ji aliye Roding (bavê kurdologan) ve li gel netekûzbûna xwe jî ferhengeke bi zimanê kurdi-îtalî hatiye pêkanîn. Her wiha Beyaz diyar kir ku cara yekemîn xebat bi awayekî sazî li Sovyetê tê kirin û zanyarê kurd Qanadê Kurdo jî di vê akademiyê de cih digire. Şefik Beyaz got ku Li Kurdistanê cara yekemîn li Bexdayê akademiya kurdi vebûye, û bal kişand ser vê yekî ku xebatîn ku wî çaxî hatine kirin niha ji bo wan weke bîngeh û mînak in. Li gorî gotina

Beyaz, ji ber ku ev xebat di nav kurdan de bûye, berhemên ku derxistine li nav kurdan belav bûne û wê akademiyê gelek xwendevan gihadine. Her wiha Beyaz got ku, dîsa di sala 1983'an de Enstituya Kurdi li Parisê ava bûye û avakarê wê jî kurd bi xwe ne. Beyaz li ser xebatîn vê enstituyê ev nîrxandin kir: "Di destpêkê de wan xebatîn pir hêja kirine, di dema tali de ji ber ku tene bi siyasetê ve hatine girêdan bi pêş neketine."

Şefik Beyaz, li ser xebatîn Enstituya kurdi ya li Stenbolê ku di sala 1992'yan de hatiye avakirin, got ku ji ber kembûna hejmara zanyaran ev sazî bi awayekî bi kemasî hatiye avakirin. Kesên ku enstitu ava kirine xebatkar, rewşenbir û welatparêz in, lê mixabin ne akademîsyen in. Ji ber vê yekî zêde berhem derneketine holê. Serokê Enstituya Kurdi Şefik Beyaz got ku ji bo ku xebatîn

akademik baştir bibin, wan destûrnâmeya (tüzük) enstituyê amade kirine û di pêserojê de wê bê nîrxandin.

Xebatîn rewşenbirî girêdayî zimîn in

Gerînendeyê Weşanê yê Rojnameya Azadiya Welat Sami Tan, bal kişand ser xwendin û nîvîsandina bi kurdi û got ku xebatîn rewşenbirî girêdayî zimîn in, girêdayî xwendin û nîvisandîne. Sami Tan diyar kir ku rewşenbirî saziyên kurd her çiqas li çanda xwe xwedî derketibin jî di nav xwe de li zimanê xwe xwedî derneketine.

Tan bal kişand ser vê yekî ku di paşerojan de jî ji aliye kurdan ve hin xebatîn zanyarî hatine kirin, wekî Şeref-name (Şerefhan Bedlisi), Mem û Zîn (Ehmedê Xanî), lê ew ji aliye serdestan ve bi zanyarî hatine vesartîn û ew wekî male tirkan dane naskirin. Her wiha wî diyar kir ku, bi taybetî li bakurê Kurdistanê, pêşîya xebatîn zanyarî girtî ye, yên ku xebatîn bi vî rengî bikin yan wê tirkîtiyê qebûl bikin, yan jî wê têkevin rewşa Sosyolog İsmail Beşîki.

Gerînendeyê Weşanê yê Azadiya Welat Sami Tan, bangî xwendevanen zanîngehan kir ku ew xebatîn bi komîkî û zanistî bikin û bi Enstituya Kurdi re têkevin têkiliyê. Û gava di nav xwe de rêtixtinan ava bikin wê di demeke kurt de di vî warî de bi pêş bikevin. Her wiha wî diyar kir ku, gava insanîn me, bi taybetî li metropolan venegerin ser çannda xwe, wê dîsa kurd bêñ pişafîtin.

Piştî axaftina semînervanan, semîner bi pirs û bersivan qediya. Zimanê semînerê bi kurmancî bû. Ji ber vê yekî, ji hinek guhdarên kirdkîaxêf rexne hatin; semînervanan dan zanîn ku ewê di çalakiyên enstituyê de ji iro pê ve vê rexneyê li ber çavan bigirin û cih bidin semînervanen kirdkîaxêf jî.. Li dora 40 kesî li semînerê guhdarî kir.

EVİN ELDEMİR

TÎŞK



LERZAN JANDIL

Kampanyaya Rojnameya Demokrasî

Demo ke mi televizyonê MED'î de reklamêde rojnameya Demokrasî dî, ez zaf biyane kîfweş. Rojnameya Demokrasî her şeme yew pirtûkê domanan bêpere kena vila. Seba naye jî ez her çî ra ver na kampanyaya rojnameya Demokrasî û rojname bi xo pîroz kena. Sebeta ke ebi seran o, gelê kesan ciyê de niyanê cê hewnî diyêne, beno, ke ebi na kampanya hewnê gelê ma û piyan, perwerdekeran û musnedaranê (mamoste) kirmancan bêro ca.

Seke êno zanayene rojnameya kirmancan ya verêne "Rojnameya Kurdistanî" roja 22.4.1898 de hete Mîqdad Midhat Bedirhanî ra Qahîre de amê çapkerdene. Emroj (ewro) 99 seriya Rojnameya Kurdistanî ma pêrine re pîroz bo. Ebi na gama dîrokiye jî kirmancan dest bi rojnamevaniye û girêdayê naye jî çapemeniye kerd.

La belê na roje ra hatanî nika qe yew rojname yan jî çapxaneyê kirmancan kampanyayêde niyanêne ra nêkerde. Beno ke dem û demêde raşt nebî. Problemê Kirmancan perwerdekerdene ra, problemanê domanan ra vêşeri, politik bî. Yan jî Rojnameyanê kirmancan û wayîrê rojnameyanê kirmancan heqê perwerdekerdene de wayîrê interese nêbî. Sebeb ci beno wo bibo, gamêde niyanêne hatanî nika niyamêbî eştenê.

Ma kampanyaya rojnameya Demokrasî teyna xo ser ro bes e? Nê, ez bi xo bawer nêkena. Çimke perwerdekerdene ebi yew het nêbana. Yanê teyna ebi pirtûkan yan jî materyalanê perwerdekerdene nêbana. Hetêde bîn yên perwerdekerdene esto. O jî piyaxebetiyya ma û piyan, musnederan û înstîtustanê kirmancan o. Ganî nê hurdmîn hetî pewbînan temam bikerê, ke prosesê perwerdekerdene bisüxiliyo.

Na der heq de kemasî estê. Verde interesa ma û piyan zaf kêmî ya. Na interesa teberê welatê de - xêca kirmancanê Swêde - bêhemd şenik a. Welat de jî hetê ra şer, hetê ra feqîriye û hetê ra jî qedr û qîmetê zonê dayike nezanayenen verê restena na interese de asteng ê.

Ganî rojnameyê ma , kovar û çapxanêyê ma bişikîyê emroj ra tepiya ebi hetkarî û piya karkerdene kampanyayanê niyanêna rakerê. Nê kampanyayı hem hetê ra materyalanê perwerdekerde kenê vêşeri (zêde), hem jî interesa kesanen ke né materyalan virazene, kenê xurt.

Heto bîn ra, sebeto ke vêşeriya şarê ma televizyonê MED'î de niyo dano, ganî né kampanyayı hetê televizyonê MED'î ra bêrê şinasayene.

Sebeta ke ma bişikîme interesa ma piyanê (malabatan) kirmancan heşar kerime yan jî ravêr berime, pêwist o ke ma sarê xo tede bidajnîme, metodanê newiyan bivînîme. Ebi senê enway û senê metodan? Ez jî nêşikîna cewabêde zelat biderî na perse. La belê ganî her kes xo het ra bixebeчиyo, şarê xo bidajno, dest ci kero, rayêde newiye, metodanê newiyan bivîno.

Bêdewlete ma dest ra teyna na êna. Ganî wayîre dewleten ebiyena kirmancan verê nê karî de asteng nêbo.

Teyrê Sîmir

Hebû tunebû carekê ji caran, rehmet li dê û bavê guhdaran, tevî mişk û maran, tevî kurmên mirdaran, lê xeynî sîxûr û mixtaran. Wê got min dot, min got we dot...

Li devereke sê bira dijiyan. Axmak, Zikmak, Çekmak; ew rencber bûne û ew sal jî kelem ajotine. Kelem bal diavêjin, gurbaz dibin. Rojekê birayek diçe nobedariya zeviyê. Rojek ji rojan birayê mezin Axmak dema ku tê zeviyê, dinihêre kelem giş belawela bûne. Têdigihije ku bi êvarê tişteke ketive zeviyê. Vedigere malê, vê bûyerê dibêje. Her sê bira şêwr dikin; divê (pêwist) e bi şev jî nobet bê girtin. Bi êvarê ve Axmak diçe zeviyê. Li taldeyekê, xwe vedişêre, diponije. Kêm zêde dibuhure, mêze dike; ka ci bibîne! Hûtek hat; lêveke wê li erdê, yek li ezman e; daket nav keleman, serobin kir. Axmak ji tırsan diricife, dest û mil lê sar dibin. Nêwêre li dij hûtê tiştekî bike. Rawil (hût) têra xwe zeviyê dipelçiqine. Axmak, bi destê sibeyê vedigere mal. Sedema ku birayêñ wî bi tırsonektiya wî henekan nekin, qet qala hûtê nake. Şeva din birayê navîn Zikmak diçe nobedariyê. Ew jî hûtê dibine û wek birayê mezin ew jî behs nake.

Lê rewşa keleman jî nebaş! Birayê biçük Çekmak lê dikeve şikê. Dor tê wî, li taldeyekê çok dide û dipê. Demeke kurt şûn de rastî hûte tê. Radigihije rima (mizrak) xwe û bêtirs lêdide. Ziya bîrîndar dibe, direve. Çekmak serî dide ser li pey dikeve. Dêw dihere ew dihere. Ji bo ku destê sibeyê birayêñ wî rîça wî bişopînin, cih bi cih kincen xwe datîne. Hût xwe bi qulekê ve berdide bin erdê, Çekmak jî li pey wî. Xwe di şikeftike tarî de dibîne. Di şikeftê de çendin ode hebûne. Çekmak xwe disperê ode a zexireya hûtê, ku tê de pez hebûne. Hût, ji kerba birînê dizare, dipelpite. Tê ber derê oyeyê diqire. Dizane Çekmak li wê ye.

Pezan yek bi yek di nava şeqa xwe re derbas dike. Bi desten xwe pişta wan kontrol dike. Çekmak mîhekê serjê dike û postê mîlî li xwe dike, bi vî awayî xwe ji wê derê difilitine, hildikişer ser stûnekê. Heya sibeyê hût li dora stûnê digere. Bi sibeyê re birayêñ wî kîncan dişopînin û têne ser kuleka şikeftê. Çekmak bang li wan dike, dibêje min derînim. Birayêñ wî di nav xwe de şêwr dikin. Axmak dibêje: "Bila di wir de bimîne wê zeviyen para wî ji me re bimîne." Zikmak dibêje "Dê mal û zexireya wî ji me re bimîne." Biryar didin wê Çekmak nefilitinim û diherin. Demeke dirêj dibuhure, Çekmak li ser stûnê pal dide, radikeve. Kokimekî rihsipî tê xewna wî. Dibêje: "Roja çarşemê du beran li şikeftê diberizin hev du, têdi-



koşin. Yek qer (res) e, yek qerqaş (spî) e. È qer tıtar û tarifi ye, yê qerqaş roj ronahî ye. Heke tu xwe biavêji ser e şerqes tu dê derkevi dinya ronak. Xwe şas neke."

Roja çarşemê bi rastî du beran êrisi hev du dikin. Lê mixabin Çekmak xwe şas dike, dêla yê qerqaş xwe diavêje ser e qer û heft qat bi erdê ve diçe xwarê. Xwe li bajarekî xerîb dibîne. Diçe ber deriyê pirejinekê, li derf dixe. Pîrê derf

venake. Gava ku Çekmak ji kîsikê xwe zêrekî dertîne, pîrê derf vedike. Çekmak jê tasek ev tika dike. Dema ku avê vedixwe têdigihije ku şor e. Sedema wê dipirse. Pîrê dibêje: "Lawo, ez ci ji te veşerim ci ji Yezdan. Ev mîza min bû te vexwar. Hûtek ketiye ber kaniya me, xitimandiye. Em rojê keçekte azeb (bêkar) dixemîlinin û diavêjin devê wî. Ji bili keça mîr tu keç neman. İro dê wê jî bidine hûtê, ku hinekî avê berde. "Çek-

mak dipirse: "Pîrê ma hûn çîma hûtê nakujin?" Pîrê dibêje: "Lawo, mirovîn dinya tarî şer ji bîr kirine.

Heke me bizanibûya şer bikira em di dinya tarî de nedijiyan." Çekmak radihije rimê xwe tê ber devê kaniyê. Dinihêre ku wa ye keça mîr xemilandine, dê biavêjin devê hût. Çekmak bi lez rima xwe di devê hûtê de diçikîne û dikuje. Şâhiyek mezin bi bajêr dikeve. Keça mîr destê xwe di xwîna hûtê dike tîli pişta Çekmak dide. Hemû kes ji bo ku ji mîr xelatê bistînin, bi xwînê xwe nişan dikin. Ên ku xwînê nabînin jî, ci sewal bi dest dixin serjê dikin û bi xwîna wan pişta xwe nişan dikin. Nûcê digihîje mîr. Mîr ferman dide, wê hemû kes bicivin ber koşka mîr. Keça mîr dibêje: "Bavo ev nîn in." Kî ma kî nema? Dibêjin: "Keçolokekî pîrê ma." Dema Çekmak tê derê koşkê keça mîr sêveke zérîn pêwer dike. Dibêje: "Yê ku hût kuşt ev e." Mîr dibêje: "De ka bixwaze, ezê hemû mal û milkan bidime te." Çekmak dibêje: "Bibore mîre min, ez tu dewlemendiyê naxwazim, heke tu dikarı, min derîne dinya ronahî." Mîr dîbersivîne "Hevalo, ev daxwazeke ji hêza min der e. Mirovîn dinya tarî ji dinya ronak agahdar nîn in. Vê daxwaza te ji xeynî Teyrê Sîmir tu kes nikare bîne cih. Lê serê wî jî bi hûtekî re di belayê de ye. Her sal çêjikên wî dibin, hê gir nebûne hût wan dixwin." Çekmak cihê civîkên Teyrê Sîmir hîn dibe û wî hûtfi jî dikuje.

Daxwaza xwe ji Teyrê Sîmir re jî dibêje. Teyr dibêje: "Ji min re heft test nan, heft kûp av û heft dawêne pez bîne. Bi rê ve gava ku min devê xwe vekir, serî carê yekî biavêje devê min." Çekmak van ji mîr distîne. Li pişta Teyrê Sîmir siwar dibe û ber bi dinya ronahî dimeşin. Wekî ku Teyr jê re gotibû serî carê tişteke diavêje dev. Gava ku edî nêzîkayî li dinya ronak dikin hemû debare diqedede. Teyr devê xwe vedike. Çekmak bêgûman şûr dije hêta xwe perçeyek goşt jêdike û diavêje devê wî. Lê Teyrê Sîmir têdigihije ku ev goşte mirov e, naxwe. Bi hev re dertene dinya ronahî. Teyrê Sîmir bi purta xwe goşte ku di binê zimanê xwe de veşartibûye bi hêta Çekmak ve dîzeliqine tî xatir ji hev dixwazin. Çekmak tê malê. Herdu birayêñ xwe jî dikuje. Ax ji axmak re, Zexire ji Zikmak re nebû ya. Çekmak jî li ser bedela dinya ronahî difikire.

Dodo dodo du nikulo
Çû.Gastinê sîxul kiro
Heya hate jinik miro
Kulik danî bavo kiro
Lahîv balgîv dirêj kiro
Raket xewn dît tu bêmiro

BERHEVKAR: MENDO MOBAR

Gazina Min

En Ferhad İçmo

piştî ci !

1995

Rojnameyeke wekî "Azadiya Welat" cihê rez û pesin û serfî raziya her nivîskar û xwendevanekî kurdperwer e. Lî mixabin dema mirov dibîne ku nivîskarekî hêja wekî "R. Dilovan" rûpelên rojnameyê bi êrî-

were bi rê dikim, bi hêvî me ku hûn van çend gotinan digel helbesta min di nav rûpelên rojnameya bedew de belav bikin digel rez û silavê min ji we tevan re.

şen kîn û zikreşî-yê reş dike û ta ku dihêle xwendevan û nivîskar xwe ji dor bidine alî, ji ber ku buhayê pêñûs û peyva durist di çavê mirov de erzan dike.

Rexne û êrîşen bi neyarî geleki ji hev dûr in, rexne alikariyek e ji bo rîbaza avakirin û pêşveçûnê. Di hejmara "40" û de ji "Azadiya Welat" gotarek bi navê "R. Dilovan" hatiye weşandin, di bin navê "Nivîsîna kitêban û erzani" de, ez vê helbesta xwe wekî bersivekê li saz gotara birêz "Dilovan" û li gorî peyvîn wî ji

Bersiv...

Berî rez û silava.
Destpêk bi navê Yezdan.
Ez vê nâmê dişînim,
Ji bo kekê Dilovan.
Li ser serê, ê wek min,
Te xwe kiriye rexnevan.?
Xwelî li serê mebe,
Guri va bûye sermiyan.

Rexnevanî ka ci ye?
Wereji bo min bêje.
Bihayê gotarekê.
Ma bi peyvîn Qirêj e?
Bi ditina dirist e,
Kesê nezan û bêhiş,
Tira erzan davêje.

Te ez dame ber tîra,
Ji min neke gazina.
Ez Ferhadê xemgîn im,
Ne givanê bizina.
Heger pêñûsê hildim,
Di gel sûnda mezina.
Kesên wek te dimînin,
Palên ceh û kizina.

Hespên fala nalkirin,
Kevjal lingê hildan.
Xêlyê bûkê nêzîk bûn,
Beqa çavên xwe kildan.
Veger li gotara xwe,
Wek peq peqa zik çaydan.
Keko rûnê li malê.
Hîn ti dûr i ji ziman.
Te riswakir yara min.

Bi wa peyvîn rût kiri.
Beyî ku ti nas bikî,
Yara li paşa derî.
Welat yare kekê min,
Her kes li ser wê dignî.
Meya kevnar çêdibe,
Ji hêsrê mîwa tîrî.

Zanebûna teyi pir,
Ji edrêse diyar e.
Çi zû ti bûy rexnevan,
Hîn qada te beyar e.
Naveroka helbesta,
Bi te gelkî dijwar e.
Helbest xewnek bilind e,
Ne birinc û savar e.

Çend gotarêney teyi rij,
Min xwendine, lê bi zor.
Te ji nik kî anîye.
Rêzimanek bêsinor?
Ma ti şûjnê nabîni.
Di wi çavê xwenî kor.?
Bawer bik ji birê xwe,
Bibe şifêrê gundor.

Keko pêñûs erzan bû,
Dema ti bûy nivîskar.
Ji vi navî bi dûrkev,
Bihêl ji bo xwedîyê kar.
Dîsa ji min bawer bik,
Qet ti naghê serê car.
Bi vi hawî tê bêji,
Sed xwezi bi sala par.

Endazyar: FERHAD İÇMO

Ji bo bîranîna Apê Xemo

CLALETTİN YÖYLER



Jînenigariya "Apê Xemo" bi şaloxdayîna du heb dostê min ên birêz (Parêzer Şerfetin Kaya, Gundî Reşîd) wiha ye: Apê Xemo ji Gundî Kirtakom a Deşta Mûşê berî destpêka Şerî Cihanê yê Yekemîn de li wî gundî hatiye dinê. Di dema destpêka wî şerî de temenê wî li dora 18 safî bûye.

Gava ku ûris welat dagir dike Apê Xemo di wê deverê de bi esîrtî dikeve destê rûsan û wî bi esîrtî derbasî nava Rûsyayê dîkin. Apê Xemo di eşaratê de 7 sal li Rûsyayê dimîne. Pişti heft sal esîrtiyê ji Rûsyayê direve û xwe diavêje vî alî sînor û tê gundê xwe yê li Bajarê Mûşê Kirekonê. Li vî gundî dizewice û dibe xudanê du heb kurên bi navê Hesen û Mihemed Reşîd, her wisa du heb keçen bi navê Zînet û Qîmet.

Li vî gundî di navbera wî û lêzimên wî de ser dertê û yek ji lêzimên wî tê kuştin. Li ser vê gewimînê Apê Xemo dibe firar û diğihîje

Seyîdxan û Elîcan. Bi vê rewşê bi wan firaran re li devera Mûşê demekê li çiya û çolan-digere. Pişti ku şopandina Dewletê li wî û hevalên wî dijwar dibe, bi wan hevalên xwe yên firar re derbasî pişt xeta Dewleta Sûriyeyê dibe.

Li Sûriyeyê nêzîkî 25 salan dimîne û bi seydayê mezin Cegerxwîn re di pişt rojê xwe de hevaliyê dike û jê fêrî doza gelnasîn. û gelperweriyê dike û bi-sedan helbestêne. Seydayê Cegerxwîn ji ber dike û ji gel re bi dilekî evîndarî û şewîti dixwîne. Apê Xemo wekî nêzîkbûna xweya bi Seydayê Cegerxwîn re, wîsa ji bi birekî gelperwer û welatparêzen din re ji hevalî û hogîriyê dike û ji wan ji hînî doza mirovahî û gelêrî û neteweyî dibe. Apê Xemo di wê dema xwe de wekî xwenas û zaneyekî hemdem rîcîka gelperwertiyê dişopîne.

Apê Xemo di nav kurdên beşa başûr de rojîn xwe yên pîr bi wate di nav 25 salan de diborîne. Li dû wê demê li Tirkîyê hilbijartînên nûnerên gel di nav partîyan de têne îdarxistin, di wê hilbijartînê de Partiya Demokrat, bi ser dikeve. Li ser wê serkeftina wê partiyê, efûyekî bi gelempîrî derdikeve. Li ser vê bîryara hanê, Apê Xemo wekî her kesî ji tawanbariya bi ceza rizgar dibe û dizivîre gundê xwe Kirtakomê.

Apê Xemo dema ku vedigere gundî bi wan

lêzimên xwe re li hev tê û xwe bi wan dide efûkirinê. Lî Apê Xemo pişti vegevîne êdi ne Xemoyê demê berî çûyîna Binxetê ye, ew Xemoyekî xwenas û gelnas û welatparêz e. Belê bi sehkirin û salixênu ku me-der barê Apê Xemo de ji heval û hogîriyê xwe yên wê devêrî bihîstün, Apê Xemo ne Xemoyê berê bû; Xemo dengbej û helbestvarîne gel û welatparêz bû.

Di jiyanâ xwe ya rojanê de her tim ji gel re qala belengazi û bindestiya gelê kurd dikir û pê re hêstîren xwe yên ji dil û kezeba şewîti wek taviyênen baranê dibarandin. Her tim, li dijberîtiya xwe ya ji mêtîngîren oll, axa, mela û şêxen paşverû re diyar dikir. Ji ber van ramanen wî yên mirovahî, paşverûyan jê re digotin: "Xemo ji rî derketiye û bûye munkirê şêxan û melan û dîn."

Apê Xemo, dema ku diçe ser dilovaniya Xweda, dîsa ji di gora xwe de ji êrîşen dagirkiran rizgar nabe. Pişti mirina bi demekê nêzîk, dagirker êrîş dibine ser malbata wî û li wan tedayê dîkin, dibêjin, gerîla hâtine ziyareta tirba Xemo û diçin li dora tirba wî dîgerin, dibêjin ka-kesekî li-wî cuxare këşaye-an-na, eger hebe ziyaret rast e. Apê Xemo di sala 1979'an de di 11'ê meha adarê de ji dinê koç kiriye û çûye ser dilovaniya xwe, Xwedê hezar rehmetê di ser gora wî de bibarîne.

PeKeKe û PeKaKa

Sera 1994 de Kurdistan ra çend xortî yenê Stenbol ke xo rê bixeftiyê. Jewê nînan tirkî nêzano, ê bînî zanê. Nê yenê geyrenê, geyrenê, la belê nêşenê kar bivînê. Stenbol de jî kesê nînan çînyo, qandê coya şew qahwandê şewrayan de yan jî tevera cayê kewnê.

Nê fina rojê şinê kar bigeyrê, ewne-nê jû erabawa polîsan yena nînan het vindena û nînan çekenê eraba miyan. O roj jî name dê Bahtiyar Aydîni de jew serlesker Lice de kişyeno, co ka polisi zey kutikandê haran kotî kurdî û êkê kurdan manenê genê binçim. Ca wo ke nê xortan genê binçim ja ra jew lajeko İspartayij ravêreno, o jî zey nê xortan amewo Stenbol de ke xo rê bixeftiyo la belê ey jî kar nêdiyo û pereyê ci jî qedayê, qandê coya ardiş û gjikîya kewtê pê miyan. Co ka polisi vanê no jî kurdo ma ney jî bigim. Polisi nînan genê benê qeraqol û çekenê hucran. Badê çend deqan jew kömsêr yeno û vano:

– Pe ka ka lilar bu tarafa ayrılsın (wa pe ka ka lî aviryê na kışt). Senî ke komsêr wina vano: “İspartayij” inan ra aviryeno, no ke aviryeno komsêr vano:

– Wîlan sen Pe ka ka limisin? (La ti



Pe ka ka liyê ?).

Lajek:

– Evet Pe ka ka liyim, (e e ez Pe ka lî ya).

Senî ke lajek wina vano, komsêr hêrs beno û ze kutiko har reseno lajekî û vano:

– Şu köpeğe bakın, korkmadan Pe kaka li olduğunu söylüyor (La hele bewnê nê kutik, bêtars vano ez Pe ka ka

lî ya).

Lajek vano:

– Şima Pe ka ka lî niyê çiçyê ? Pe ke ke lî bî diha rind o.

Qomsêr hema ageyreno xortan dê kurdan û vano:

– Şima Pe ka ka liye yan jî Pe ke ke liyê ?

Hema nê xortî vanê ma jî zey İspartayijî mi. Nê ke wina vanê o ko tirkî nê-

zano vano: “Qomsêro se vano” nê ji vanê o yo vano: “Şima Pe ka ka liyê yan jî Pe ke ke liyê”, ma jî vat ma pe ka ka lîm.

Lajeko ke tirkî nêzano:

– Aferim şima rê, rast o, ma kurdî pêro pe ke ke lîm, metarsê heme ca di vajê.

Senî ke qomsêr vengê PKK e eşne-no hema tiло beno û vano o yo se vano:

Xortî vanê:

– Efendim diyor kî kurtlerin ne pe ke ke yle ne de pe ka ka yla uzaktan veya yakıdan bağlantısı yoktur diyor. (Dûrî ra nezdî ra alaçeyê kurdan PKK ra çînyo).

Nê senî ke wina vanê qomsêr aferim vano û nînan viradeno. Nê ke qeraqol ra vejenê o ko tirkî nêzano vano :

– Ney ma ci ra viraday, mi vat ma kurdî pêro PKK lîm ancî ey ma viraday mî nê girwey ra teva fahm nê-kerd.

Lajeko bîn vano:

– Mi qisêyê to çewt açarnay, qandê coya mi vat ma pe ka ka lî nîm, ma nê-vat ma PKK lî mi rastî jî wînya. Ey vat qayê ma PKK lî jî nîm, qandê coya ma viraday.

M. DREWŞ

BIXELAT...

XACEPIRSA BIXELAT (65)

XACEPIRSA

Şube/İstihâza Ferîde/Kurde Çaprazalanma	M	K	M	S	A
Kurde/Kurde Çaprazalanma	S	A	L	A	R
E	H	A	W	A	R
Ü	M	D	T	I	S
A	Ü	G	A	S	A
D	A	A	D	A	D
A	N	N	A	L	A
N	E	V	P	E	N
E	Z	B	A	R	A
A	İ	S	A	L	M
Z	I	N	T	E	N
PEYVA					MEDT

Bersiva Xacepirsa 63'yan

EMIR GELADET BEDIR XAN
& ROGER LESCOT

Kürde
Dilbilgisi

Xacepirsa me bixelat e.
Di 15 rojan de ci bersiv
bigihîjin me, emê wan
binixînin û bi riya pişkê li 5
kesan belav bikin. Xelata
hejmara me ya 65'an pirtfîka
“Kürte Dilbilgisi”ye

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê
nirxandin, divê hûn
“Peyva Vesari” di nava
qutiyen li bin xacepirse-de
binivisin û tevî navnîşana
xwe ji me re bigînîn.

Naveki jinan Niviskarek (Wêne)		Bi kurdi oto		Di argoyê de ronak bir		Polisê Amerikayê Rev		Germahi		Gumgum
	→			1						5
Komeleya, niviskaran		Mandela		Ne birçi Melayika				3	Qertafa neyiniyê Rengek	
	→		↓	Pê nan çê dîkin Lakin	→		6			Koka lêk- era zayinê
Xemgin	→									
Oksijen	↓	Diji mî Birben, qalûnc	→	4		Tipek qertafeke neyiniyê		Çewt Navek		
Osmiyom ... kar	→			Serhişki Kevirek	→					
	↓				↓					
Encam, dawi		Cinavkeke kesane	→	Cinavka ew Cinavkeke kesane	→		Ard		Sembola argonê	
	2							1 2 3 4 5 6		

Pênc kesenî ku xelata xacepirsa hejmara 63'yan Kolay Kürde qezegc kirine. Cezmi Etañ/Ankara, Münir Döger/Amed, Mahsum Aydin/İskenderun, Rezan Yıldız/İskenderun, Ayhan Çaçan/İzmir

PEYVA VEŞARI



"Zarokê kurd perwerdehiya bi zimanê xwe dixwazin"

Roj a 23'ê avrêlê zarokê kurd xwest di Qonaxa Ízmîrê bimeşin bi mabesta helwesta dewletê ya di waê şer de protesto bikin Girseya zarakan, bi pêşewatiya zarokê ku li NÇM'ê perwerde dibin û pêk hatibû. Gelek dayik û bavan, xort û keçan zarok bi tenê nehiştibûn. Li hêlekê di deste wan de nepoxên (balon) kesk û sor û zer, li hêla din afişê weki 'Em bi zimanê zikmaki perwerdehiyê dixwazin', 'Em mafêna zarakan dixwazin', 'Em kulsîkîn astiyê ne' di destê wan de bû.

Zarokan xwest ku heta Qada Qonaxê bimeşin lê polisan barîqat li pêşiya wan danî, ji wan zêdetir polis hatin ber avâhiya HADEP'a Qonaxê, zarakan çalakiya xwe li ber avâhiya HADEP'ê pêk anî, dirûşmeyen xwe avêtin. Polisan nehiştin ew daxuyaniya çapemeniyê bidin û zarok belav bûn.

Cejna Qurbanê pîroz be

Em, Cejna gelê kurd, tirk û hemû alema İslâmê ya Qurbanê pîroz dîkin. Daxwaza me rojên bêşer, bêderd û bêkeder, ji her kesî re ji her kesî re demokrasî û heq û huquqek û wekheviya siyasi û aborî ye.

Komeleya Xebatkaren Avahîyan
(İCD) / Stenbol

abadîn: sermedî, timî
ayende: pêşeroj
baregeh: kamp
bendav: baraj
binpêkirin: îhlakîrin
çareserkirin: helkirin
çejik: dêjik, çelik
danişin: rûniştin (oturum)
damezirandin: sazkirin, avakirin
derûni: giyanî (psikolojik)
derfet: imkan, (olanak)
dirav: pere
endazyar: muhendis
hevkeş: nuvaze (denge)
hevpar: ortax
hincet: mazeret (gerekçe)

Festivâlya Kurteçirokan a NÇM

Nâvenda Çanda Mezopotamya pêşbaziya kurteçirokan li dar dixe. Ev kurteçirok ji bo proje ya filmên dirêj û kin ji wê bêñ nîrxandin. Divê kurteçirok bi zimanê kurdû û tirkî bêñ nîvîsin. Dîrejiya kurteçirokan bi rûpelên A4'an û heri pir 10 rûpel wê bêñ qebulkirin. Yen ku du nîrxandina jûriyê dê bi ser bikevin, wê di çalakiyê cur bi cur de bêñ xelatkirin. Xelatdayîn wê bi merasimêkê li NÇM'ê pêk were. Her wiha, tê armanckirin ku pişî nîrxandinê, Kurteçirok weki pirtûk bêne çapkirin. Encama pêşbaziye, heri dereng wê roja 1'ê gelawêja 1997'an wê ji raşa giştî re bêñ daxuyandin. Serîlêdanêñ ji bo pêşbaziye bi riya postê yan ji rasterast li beşa sine-mayê ya NÇM dikarin bê kirin.

Roja serîlêdana tali 30'yê pûşpera 1997'an

Xelat

Ya/ê yekemîn:

Hemû pirtûkên çirokan ên Yılmaz Güney 10 kasetên videoyê yên filmê Yılmaz Güney Ji her kaseteke muzikê ku NÇM'ê derxistîye yek Kasetên videoyê yên listikên Teatra Jiyana Nû

Yê/a duyemîn:

Hemû pirtûkên çirokan ên Yılmaz Güney Ji her kaseteke muzikê ku NÇM'ê derxistîye yek Kasetên videoyê yên listikên Teatra Jiyana Nû Têbinî: Ji bo ku em bi we re têkiliyê deynin, telefon û navnîşana xwe binivîsin.

Jûrî
Semir Aslanyürek (M.U. Sinema-TV.)
M.Zahir Kayan (Kovara Jiyana Rewşen)
Abdullah Keskin (Weşanxaneya Avesta)
Hüseyin Kuzu (Senarist)
Kazım Öz (NÇM Sinema)
Ahmet Soner (Derhêner)
Sami Tan (Rojnameya Azadiya Welat)

Navnîşan: İstiklal Cad.No:373 Turhol Han, Beyoğlu/İstanbul
Tel: 251 85 06-07 Faks: 251 86 06

Ferhengok

hişmendi: şuur (bilinc)
hût: dêw, cinawir
jîberkirin: ezbérkirin
jûr: menzel (oda)
kôkim: kal û pîr (ata)
kurdnas: kurdolog
malaqtı: meliqin (yaltaklanmak)
mebest: armanç
mist: tiji
nîrxandin: değerlendirme
nîgarkirin: neqîsandin
nîjad: irq pêledeburûn
nîgas: xeyal
paxav: hesibandin

pêst: kotekü, çewsandin
pêkutî: çewsandin, (baskı)
pişafîn: asîmîlasyon
qînik: qîrnî (kene)
rade: ast, sewiye
rêbaz: metod, azîn
rim: mîzrak
sewal: ajal, lawir (hayvan)
silbûn: xeyidîn, suçûyîn (küsmek)
sixûr: ajan
şûnewar: raborî
têlîn rasayı: têlîn direhî
tiflik: oçax, argûn
xemsarı: ihmalkar
xislet: taybetî, xisûsiyet
zeynîr: zana (Bilimadamlı)

Azadiya WELAT

Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayinehik
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedi (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

NAVNIŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX
(0 212)
251 90 13

Gerînendeyê Weşanê
(Yayin Yönetmeni)
SAMÎ TAN

Berpîrsê Karêñ
Nîvsaran
(Yazî İsleri Müdürü)
DÜZGÜN DENİZ

Berpîrsê Saziyê
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.S.

BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

NÜNERİTYİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)-
Nimînendeyê Gişî
yê Ewrûpâyê:
M. Rojava

Suriye:
Jan Dost
Hesîm Yûsîv
Berlin:
Sîlêman Sido
49-30-69002695

Hannover:
Sîlîm Biçük
49-5721-81360

Munchen:
Mahmut Gergerli
49-871-670884

BrukSEL:
Medenî Ferho
32-02-4663037
Stockholm:
Robin Rewşen
46-8-7510564

Bonn:
Ahmet Baraçkîlîç
49 228 66 62 49
Celle:
Wezir Saçık
49 50 52 87 36

Serokê İHD'ya Amedê Parêzer Mahmut Şakar:

Pirsgirêka kurdî heta çareser nebe mafêni mirovan wê bê binpêkirin

hün dikarin li ser rewşa dawîn ya herêmê û binpêkirina mafêni mirovan hinek agahiyan bidin me, gelo li herêmê tiştek guheriye an na?

Ji aliyê binpêkirina mafêni mirovan ve, li herêmê heta vê gavê tu tişt neguheriye. Di van mehêni dawîn de disa şewitandin û valakirina gundan û cînayetên failli meçhûl didomin. Ne ji aliyê vesârî û ne jî îxlalîn ku eşkere têne kirin ve tu guherin çenebûye. Fikri Özgen hate windakirin û M. Şirin Önen jî hate infazkirin ev tişt tev rastiyê derdixine holê.

Partiya Refahê ji bo çareseriye pirsgirêka aborî û mafêni mirovan paketeke aborî pêşkeshî MGK'ê kir, gelo ev çigas cidiye û vê paketê ji tiştek li herêmê neguheri?

Ez bawer nakim cidiyeta RP'ê di vî warî de hebe, ji ber ku ev pirsgirêka aborî ye. Ev pirsgirêkeke siyasiye û divê çareserî ji siyasi be. Lewre paketê aborî nikarin problemê hel bikin, di vê maneyê de bi nêziktedayîneke aborî nikarin di rastiyê de pirsgirêken herêmê serüber bikin, heta çareseriyeke siyasi nebe pirsgirêka çareser nabe.

Hin heyetên ewrûpi ji van demen dawîn gava têr Tirkîyeyê dibînin û dibêjin li Tirkîyeyê piroblema kurd û tirkan nîn e. Problema mafêni mirovan heye yanê bi awayekî dibêjin pirsgirêka kurdî nîn e. Hün ji vê ditinê re ci dibêjin?

Bi taybetü ev 5 salêni dawîn e ku li Tirkîyeyê egera sereke ya binpêkirina mafêni mirovan pirsgirêka kurd e. Dewleta tirk li herêmê li ser gel ev 10 sal in tade, pêkûti û şidetê dimeşine; gund têne şewitandin, qetliam têne kirin, mafêni mirovan ên bingehîn têne binpêkirin. Ev bi gişt bi pirsgirêka kurd ve girêdayî ne.

Em hem weki sazi (Komeleya Mafêni Mirovan) hem jî weki şexs di her platforme de jêderka pirsgirêke tînine holê. Jixwe xebatêni ku em dikin dema bi baldarî lê bê nihîrîn, jêderka îxlalkirina mafêni mirovan derdikeye rasfî. Anglo di hemû hevdîtin û guftugoyan de tê daxuyandîn ku pirsgirêka ne pirsgirêka mafêni mirovan e, pirsgirêka geleki ye. Ev jî ancax bi awayekî siyasi dikare bê çareserkirin, rastî jî ev e. Hin politikavanen ewrûpi bi awayekî din binirxînin jî, raya giştî ya Ewtîyapê vê pirsgirêka mîna pirsgirêkeke dûri xwe na-

bîne û ew xwedî quwetekêne, di hevdîtinê me de ew jî aştiyekî siyasi pêwist dibîn.

Dewleten ewrûpi ji bo çareseriyeke siyasi ew qas ne aktif in, gelo sebebî ci ye, ji bo ci xwe jê dûr digirin?

Di rastiyê de tevî hemû îdiayen xwe yên demokratîyê ji dewleten ewrûpi ji bo berjewendiyen xwe, ji bo aboriya xwe dixebitin. Ew aştiyê û mafêni mirovan li pêş berjewendiyen xwe nagirin. Ev ji politikayen wan ên dewletê ne. Lî belê her diçe ew jî dibînin ku ev pirsgirêka wan jî weki şerpençeyê dipêce, berjewendiyen wan ên aborî jî dixe talûkeyê. Nêziktedayîna wan a bi vî rengî rengî pirsgirêke diguherîne. Ji ber vê jî raya ewrûpye ya giştî giraniya xwe nîşan dide. Ew jî dizanîn ku ev pirsgirêka ancax bi awayekî siyasi tê çareserkirin, ji ber wê jî hin gavên cidiye têne avetiñ.


Demekê berê rojnamegerekî ingiliz ji bo pîrozba-hiyen Newrozê hatibû Kurdistane û wî bi Waliye Herêmê Necati Bilican re hevpeyvînek çekiriye, Bilican gotiye "ji HADEP'ê bigire heta İHD'ê hemû rîxistinê sivil terorist in, şaxen PKK'ê yên sivil in." Hün ji vê ditinê wali re ci dibêjin?

Em van ditin û ramanan cidi nabînin, di demen dawîn de li herêmê îxlalkirina mafêni mirovan kêm bûne, sedema vê yekê jî xebatêni Komaleya Mafêni Mirovan e. Ev 5 sal in dawîn e ku İHD kîrinê li dijî rîz û rîcikîn mafêni mirovan teşhir dike hem li Tirkîyeyê, hem jî di qada navneteweyî de. Hemû hêrsbûna wan jî vir tê. Ew tu kesen müxalîf li ber pozê xwe naxwazîn ji bo ku rî ber müxalîf xwe bigirin, ji bili şîdet û pêkutiya ku li wan dikin, wan weki terorist jî nîşan didin.

Pêkûti û tâdeyên li ser Komaleya cî ne, bi ci awayî xebatêni we dixin astengiyê?

Ji sala 1991'ê vir ve li ser komaleye pêkûtiye mezîn hene, 12 hevalen me şehîd ketin, gelek jî wan hatine girtin û gelek jî ji ber rewşa xwe mecbûr man derkevinê derive. Li ser gel çawa şîdet heye li ser komaleye jî heman tişt tê meşandin. Her wiha ew çigas mafêni mirovan binpê bikin eme jî ew qas li hemberî wan derkevin.

Gelo psîkolajîya gel li herêmê çawa ye, gel ji bo çareseriyeke siyasi çigas hêvidar e?



SEROKÊ İHD'YA AMEDÊ PARÊZER MAHMUT ŞAKAR

Tabî gel jî baweriya wî ew e ku ev pirsgirêka bi awayekî siyasi û bi metodên aştiyane bê çareserkirin. Nêziktedayîneke wiha heye. Pirsgirêka ci dibe bila bibe ji qebulkirîne wê de, jêderka şer li holê ye ev ji pirsgirêka kurd ye, xwe sfadenekirina gelê kurd e.

Li Girtîgeha Amedê berî demekê 10 girtîyen PKK'yî hatin qetilkirin, encam bû ci?

Di 24'ê rezbera 1996'an de li Girtîgeha Amedê bi erîşa polis leşker û memûran li ser girtîyen PKK'yî deh girtî bi awayekî wehşiyane hatine qetilkirin. Pişti bûyerê li ser reaksiyonaya raya giştî çend mudir ji kar hatin dûrxistin, ya rastîn ew şandin cihêni din ji bo ku ser bûyerê bigirin. Di vê bûyerê de girtîyen ku hatibûn birfinâdarîn jî li wan doz hate vekirin, ev doz hê jî didome, lê pişt re kesen ku ji bûyerê berpîs bûn li wan jî doz hate vekirin, heta weki ku tu tişt neqewimî be hate nîşandan û hate diyarkirin ku di navbera wan de şer derketiye. A rast polis leşker û memûren girtîgeha girtî di cihekî de dorpêç kirine û ew qetilkirine. Wan rasterast ji bo ku ser bûyerê bigirin ci ji destê wan tê dikin, lê eme vê qetliam heta dawîye teqîb bikin.

Dewlet li Newrozê ji xwedî derket û bixwe pîroz dike ev ji aliyê mafêni mirovan ve gelo rewşeye çawa ye?

Carekê Newroz cejna gelên Rojhîta Navîn û cejna gelê kurd e. Bi sedan sal e ku ji aliyê wan ve tê pîrozkin. Di sala 1992'yan de bi sedan insan di pîrozkin. Newrozê de hatine kuşin, wê nikaribû rî li ber bigire, qedexe kir. Lî gelê kurd li gorî çand û toreyâ xwe û nîrxên xwe ew pîroz kir. Îcar jî dewlet lê xwedî derdikeve ji bo ku naveroka Newrozê vala bike û ji nîrxên kurdan dûr bixe. Lî Newrozâ 97'yan tevî kîrinê dewletê vala derxist. Bêgu-man ji aliyê mafêni insanî ve ev rûye dewletê yê rastîn nîşan dide.

Dewlet û medya her tim didine xuyakîn ku li herêmê dawîya PKK'ê hatîye. Hün zêdetir nêzîki ser in gelo ev çigas rast e?

Ev şerekî psîkolojîk e, derew an ji rast dibêjin li Dêrsinê, li Bingolê nîzam 40–50 PKK'yî hatine kuşin. Li aliyê din disa dibêjin hêzîn me 400–500 PKK'yî dorpêç kirine. Ev agahî jixwe nîşan didin ku wan çigas PKK qedandiye. Ev şerekî psîkolojîk e û bi awayekî xwe tatmîn di-kin.

HEVPEYVÎN: M. AKSOY